

jineolojî



“PROJEYA MIN A NÎVÇE MAYE, BI JÎNEOLOJIYÊ RE JÎ MEŞIYA”

- REBÊR APO



# NAVEROK


1 PÊŞGOTIN
2 BI DENG Û RENGÊ JINÊN CIWAN JINEOLOJÎ (DESTPÊK)
3 JIN BI XWEBÛYINÊ BER BI AZADIYÊ VE DIMEŞIN
4 DI RÊWITIYA XWEBUYINÊ DE NASKIRINA LAŞÊ XWE
5 BI ZANEBÛYINA AZADIYA JIN ŞER KIRIN Û XWE PARASTIN
6 LI HEMBER XWEDAYÊN MÊR
BÛYINA XWEDAWENDEK SERHILDÊR: AFRODITBÛYIN
7 DÎ SERDÊMA KAPÎTALIZME DÊ MODA Û HESÛT BÛYÎN
8 ŞÎFREYA ZAYENDPERESTIYÊ MALBATGERI
9 JIYAN BI ÇANDA JINÊ BEDEW DIBE
10 JÎNGEH
11 BI MEYZEKIRINA JİNÊ KÛANTÛM
12 DI ROJA ME İRO DE ŞERÊ BE EHLAQ KÛ LI
SER JINÊN CIWAN TÊ MEŞANDIN
13 LI HEMBER DÎROKA DESTHILATDARAN
BI TEKOŞÎNÊ RE NÛ VEJÎNEK
14 PARAZVANÊN JİINEOLOJÎ: JINÊN CIWAN

# PÊŞGOTİN

Broşûra me ya  jineolojî ji pênûsa jinên ciwan, ji ramanên dilê wan herîkî  û hat amadekirin.   Ji bo jineolojî bê naskirin û fêmkirin  bi meyzekirina jinên ciwan ve hatiye  nivîsandin. Bi taybetî  ji bo li hemberî polîtîkayên dijmin ên li ser jinên ciwan tê meşandin seknekê rast were raberkirin pêdîvî hat dîtin ku hin mijar ji nû ve werin destgirtin û şîrovekirin. Wek akademîya Ş.Leyla Şaylemez dewreya Ş. Nûcan Serdoz  broşûra Jineolojî ya me amadekiriye de her endamekê  dewrê mijarek destgirtiye. Broşûra bi bawerîya jinên ciwanên ku di şoreşê de rista pêşengtîyê dileyzin hatiye amadekirin ji bo hemû jinan bingehek girînge. Ev broşûra deste we de ji bo jinên ciwan   bi zanistek rast ve bikaribin jîyanê ji nû ve bihûnin û biafirînîn ewê bibe çavkanîyek bi hêz.  Hêvîya me ewe ku jineolojî asoya jinên ciwan berfirehtir bike û ji bo hemû jinên ciwan bibe rênîşandar.

**KOMÎTEYA AMADEKAR**
**2025**

# BEŞA 1

# BI DENG Û RENGÊ JINÊN CIWAN JINEOLOJÎ



"Em di destpêka dîrokê de, dîrok di rojame ya îro de vêşartiye." Ev gotina watedar ya Serokatî tîne ziman ji bo fêmkirina rastiya jin û dirokê, dahûrandina dîroka mirovahiyê û avabuyinê pêwîstî bi rast fêmkirin û lêkolînkirina vê gotinê heye. Rastîya jin ya li ser xaka Mezopotamya ku di nava pêşketinên civakî yên di asta şoreşê de pêkhatiye, di nav heqîqeta çanda xwedawendan de veşartiye. Çanda xwedawendî pêşketina yekem ya civaka exlaqî û polîtîk e. Pênaseya jiyana wekhev û azad ya derdora jinê de hatîye hunandin e. Nişaneyên xwedawendiyê hatine avakirin afirinertî û hêza jinê nîşan dide. Danehevên bi keda jinê çêbûne bi aqlê cîvakê re dibe yek û ev jî bi xwe re nûbûyînê pêşdixîne.

Em jî berhemên çandînî û amûrên jîyanî bigrin heta bawerî, tenduristiya xwezayî, hûner û hwd. pêşketin bi xwe re aniye. Feraseta pênç hezar sal berê hatiye avakirin li hember rastiya civaka desthilatdarî û zordestî ava dike û ev dûrî rastîya jiyana vê civakê ye. Desthilatdarî li hember rastiya jîyanê û fikra azad bi taybet di şexsê jinê de koletiyê ferz dike, zanyarî û ramanên ku jinê afirandiye û xistiye jiyanê ji wê didize û van li dijî civakê bikartîne. Li gel vê bi vê rêbazê jinê dixîne û koletîyê dide avakirin.

Heman demê desthilatdarî di asta kes de jî tê jiyankirin û serweriya xwe li ser xweza û civakê ferz dike. Ji bo hêza xwe avabike li hember nirxên civakê berjewendiyen xwe esas digire û zordariyê dike. Dîrokê de desthilatdarî xwe bi awayekî pergalî domandiye û ev jî bûye sedem ku li nav civak û xwezayê de qeyran û qrîzek bê jiyîn û pirsgirêkên bûne girêkor di roja me ya îro de kûrtir bibin. Heman demê desthilatdarî bi pergala kapîtalîzmê re gîhiştiye asta lûtkeyê. Ji ber kapîtalizm li ser vê ferasetê xwe avakiriye, ji pirsgirekan sudwerdigre û li ser van qeyranan hebûna xwe mayînde dike. Di nava civakê de taybet di nava ciwanan de pergal dixwaze bandoriya xwe avabike. Heman demê jinên ciwan ji bo pergalê hedefên taybet in. Pergala kapitalist hewl dide jinên ciwan yên li gor karakterê kapîtalîst avabike û bi vê rêyê dixwaze xwe di nava tevahî civakê de belav bike. Roja îro di nava jinên ciwan de şêwazê jiyana liberal û takekes tê avakirin. Ew qûtbûyîna ji rastîya civakê ye û dûvre jî bi vê rêbazê jinên ciwan xistine mîna amûrekê . Di encam de jinên ciwan tînin wê astê ku bi zilamekê bên girêdan û jiyana xwe bi wî zilamî re sînordar bikin. Li kuderê bibe bila bibe encamê de ew jin dibe milkê zilam. Di nava malbatê de ev zilam bavê malê ye, piştî zewace jî ev zilam mêr

û sermiyanê malê ye. Bi vî awayî ji xwebûna xwe durbuyin tê jiyankirin. Li hember desthilatdarî ji alîyê jinên ciwan ve her tim berxwedanek pêşketiye. Her çiqasî bi êrişan re rû bi rû mabe jî di cewherde heqîqetek heye. Lê belê ya girîng ewe di vê cewherê de heqîqetek heye û divê vê cewherê derxinîn zanebûnê. Rêber APO ji bo jineolojî avabibe hewldan û kedek mezin raber kiriye. Li hember pergala ku jînê wek meta dinirxîne Serokatî jinê wek nirxek mezin bi dest digre. Jineolojî tê wateya " Zanista Jinê". Ew zanist li hember pirsgirekên jinan çareserî peyda dike û bi çavê jinên ciwan li jiyanê mêzedike. Şewazê zanîsta kû pergal avakiriye jinan jî cîvakê, ji nirxê wê, ji afirineriya wê dûr dixîne.

Lê jineolojî taybetmendîyên jin derdixe zanebûnê û dike şewazê jîyanê. Taybetmendiyek din ya jineolojîyê jî ewe ku ji birdozî yan jî ji fîkrek teng wêdetir zanisteke gerdûnîye û xitabî hemu jinên cihanê dike. Ji kîjan netew, welat, civakê dibe bila bibe her jinek dikare Jineolojî esas bigre û mêzandina xwe ji bo jîyanê bigûhere û vegere cewhera xwe. Ev zanebûn avadike û tekoşîne pêşdixe. Li hemberî zanista pozitif ya dogmatîk zanista li ser esasê quantum û felsefê peşdixe. Jineolojî ji avabuyinê heta niha pêşketinên ber bi çav avakiriye û her diçe xwe berfireh dike. Fikrên nayên guhertin re cîh nade.


Heman demê de pêşxistina zanista xwe de rêbazê ku bikartine ji zanistên pozîtîvîst cûdatir e. Yêk ji van rêbazan ewe ku avakirina zanebunê ser êsasê civaka exlaqi- polîtîk e. Ya din jî zayendperestiya ku nava pergala kapîtalîst de hatîye pêşxistin qebul nake û li hember vê têdikoşê. Hertim nava lêgerîna watedarkirina jiyanê de ye û milê manewî ya heqîqetê digere. Eger zanistek nikaribe jîyanê dewlemend bike û durî civakê be wê qet feydê xwe jî nebe. Di roja me de zanistên civakî jîyanê ifade nakin. Jineolojî li hember van zanistên zilamsalar yên heyi alternatîfek bi hêz e. Li hemberî êrîşên derûnî û fîzîkî yên li ser jinên ciwan tên pêşxistin weke parastina cewherî û exlaqî yê.

Rêber APO 2008'an di pirtûka Sosyolojîya Azadî de zanista jin ya bi navê "Jineolojî" pêşnîyar dike. Dîyar dike ku pêwîstîya tekoşîna jinê bi zanistê heye. Ev 10 sale bingeha vê zanistê hatiye danîn û di çarçoveya nîqaş û komîteyên li hemû Kurdîstanê hatine avakirin de xebatê jineolojî tê meşandin. Jineolojî li Rojava'yê Kurdistanê, li Mexmûr û li Avrupa li dibistanan de wek ders tê dayîn. Lî Almanya enstituyek bi navê Andrea Wolf (Ş. Ronahî) hat avakirin û li vêderê semîner û perwerde tên dayîn.

Li gel van li Elmanya, İspanya, Latîn Amerîka û Danîmarka Kampên Jineolojî hatîn çêkirin. Li Mexmûrê di çarcoveya vê xebatê de lêkolînek sosyolojîk hat amadekirin. Li Rojavayê Kurdistanê ji alîyê jinên ciwan ve perwerde û Qampên Jineolojî hatin vekirin û komîtêyên Jineolojî Ciwan hatine avakirin. Li ser van esasan pewistî pê heye ku hemû jinên ciwan Jineolojî nasbikin û li ser vê zanistê lêkolînan pêşbixin. Me bi vê broşûre xwest hinek bêşên Jineolojî û destgirtina jinên ciwan ya Jineolojî bidin nasîn.

Em bawerîn ku bibe çavkanîyek baş. Wêkî Rêbertî tîne zîman wê Jineolojî jinê di alîyê felsefede pêşbixê. Jineolojî ji bo hemû jinan derketiye. Li ser vê esasê jinên ciwan dikarin cewher û zanebûnek xurt di xwe de avabikin. Têkoşina xwe li ser vî esasî bilindbikin. Nirxên ku ji jinê hatin girtin wê li ser xaka pîroz bi Jineolojîyê re careke din bên peyda kirin.

## “JINEOLOJÎ TAYBETMENDÎYÊN JIN DERDIXE ZANEBÛNÊ Û DIKE ŞEWAZÊ JÎYANÊ”








# BEŞA 2

# JIN BI XWEBÛYINÊ BER BI AZADIYÊ VE DIMEŞIN



Çima di roja me ya îro de gîhiştina Xwebûnê ewqas girînge ? Xwebûn ji bo jinêkî ciwan tê çi wateyê ? Ti hebûn bê ku ya xwe bibe (xwe nasbike) nikare jiyan bike. Ya ku me dike Xwêbûn rengê me yê jinên ciwan e. Yên ku ji cewhera xwe qut nabin, dikarin nav dewlemendiyên cîhanê de bi xwebûna xwe jîyan bikin. Modernîteya Kapitalist hêrî zêde jinên ciwan, ji xwêbûnê dûrdixîne. Ji bo kêlîyek be jî jinên ciwan hîs nekin ya xwe ne. Dema jinên ciwan li eynikê mêyzedikin hîsdikin ku cewherê wan nateyise derve. Dema we jî eynikê mêzand we jî hîskir hûn ne ya xwe ne yan na? Jiyana ku pergala baviksalar ji bo jinên ciwan amade kiriye înkara jiyanê ye. Taybet her rol û mîsyonên teng û bê wate dide jinên ciwan. Ew rol û mîsyonê tê dayîn di her keliya jiyanêde tîne bîra jinên ciwan. Di nav jîyanêde jinekî ciwan her rola keçik, xwîşk û piştre jî hevjin û dayik dilîze.

Herdem nasnameyên cûda jiyan dike, tû car nasnameya xwe ya esasî jiyan nake. Erk û bendewariyên ji jinên ciwan tenê xizmetkirine. Mînaka wê jî di mal de ya herî kedkare. Di malbatê de taybetî bi araste dayîna bav re karê xwe hildibijêre. Li gor xwestekê hevjine xwe şêwe digre. Lê piştî dibe dayik hemû jîyana xwe dîyariya zarokên xwe dike. Çawa dibe ku jina ciwan ya ku enerjî û potansîyela wî ewqas mezine jîyanekî ewqas nav sînoran de û tengasîyan de qebul dike û jîyan dike. Di vîr de çawa ku bazekî tê kedîkirin jînên ciwan jî wisa tên desgirtin. Bazê ku di nav qefesa cam de ye, xwe çiqas qefesê dide jî nikare xwe xilas bike, xwe azad hîs nake û jî piştî demekî dev ji firandinê berdide, ferî sînoran dibe. Êdî dema ku berdidin jî dev sînoran bernade. Ew fêrbûyîna koletiyê demekî dirêj dixwaze û dîşibe tarzê mezinkirina jinên ciwan. Vegerandina xwebûna xwe ji bo jinêkî ciwan bersiva herî xûrt ya hember van erişên bê nasname hîştin û sînor danînê ye. Xwebûn hemberî bê nasnamebûyînê, şerê nasname ye.

Nasnameya esasî ya jinên ciwan çi ye ? Bersiva vê pirsê em dikarin vegera zîhnîyeta ku di dema Neolîtîkê dihat jiyan kirin de bibinin. Jin di serdema Neolîtîkê de, di şexsê dayik-xwedawendan de ji civaka xwe re pêşengtî kiriye. Di Kurdî de xweda, xwedawend tê maneya ku xwe dide (dayin) ye . Jin bi pêşengtîya xwe, dewlemendbûyîna xwe rolê xwe yê fêrkirinê, hemû zanebûna xwe dide civaka azad û wekhev. Ji bo nasname rola ku ji bo îrade avakirinê ji xwe bawerbûyin, di fikrê xwe anîna ser ziman de bê gûman giringe û ya esasî ye. Bê ku bikeve bin bandora kesên

din ser linge xwe sekinandin tekoşîna jiyanê dayîn pir giringe. Divê asta xwe berpirsiyar dîtin hember jiyanê pir zirav be û teng fikirandin asta jor de bê derbaskirin. Taybetî jinên ciwan ji bo ku jiyanê xweşik bikin divê di hemû qadên jiyanê de bi enerjî û dînamizma xwe jiyanê rengdar bikin. Ji ber jinên ciwan ji guhertin û vegûhertinê re vekiriyê, dikarin zûtir xwe bigûherînin. Bi dînanîzma ku ciwantî dide, bi îradeya jinê ya ku nabe maddiyata tû kesî, hêzekî pir bi bandor derdixe pêş û li hember pergala baviksalar ku dixwazê jinên ciwan bitepisîne jinên ciwan bi potansîyela xwe ya veşartî vedigerin Amargî. Amargî peyvekî Sumerî ye. Tê wateya vegera dayik. Ji bo gûhertin û vegûhertine pêwîstî bi tekoşîna jinê heye. Rûxme ku di nav pergalê de cewher valakirin pir zêdeye jî tekoşînek pir mezin ya li hember wê tê meşandin jî bi awayeke pir zindî li ser pîya ye. Şopên Roza, Zîlan, Zarîfe û Sarya tê dîtin. Heta roja me ya îro jî ji bo azadîyê û wekhevîyê tekoşîn tê kirin. Ji bo parastina civakbûyînê her di nav şerde ne. Bi rola xwe ya ciwantî bi vê re gîredayî pêşengtî kirin, berxwedana dayikên me di vê mijarê de mînaka herî mezin e. Mînak peyva “ Ya Star” îro ji bikar tînin. Xwedawenda Star roja me ya îro de di nav jîyana me de cîhê xwe digre.

Çawa xwebûn bûyîn? Ji bo jin xwe azad bike birdozîya ku Reber APO ji bo têkoşîna azadiya jinê pêşxistiye ronahî dide û pênc rêgezên birdozîya rîzgariya jinê rênîşanderên xûrt in. Welatparêzî, fikir û vîna azad, rêxistinbûyîn, tekoşîn, etik-estetîk formûla jehrkûj ya li dijî kapîtalîzmê ye. Jin tenê û tenê dema di axa xwe de jîyan bike, fikre xwe ava bike dikare azad û wek xwe jiyan bike. Jiber vê sedemê tekoşîn meşandîn jiyanî ye. Jinên ciwan dikarin bi exlaqa xwe ya cewherî tekoşînek rast bimeşînin.

## “TAYBETÎ JINÊN CIWAN JI BO KU JIYANÊ XWEŞIK BIKIN DIVÊ DI HEMÛ QADÊN JIYANÊ DE BI ENERJÎ Û DÎNAMIZMA XWE JIYANÊ RENGDAR BIKIN”

# BEŞA 3

# DI RÊWITIYA XWEBUYINÊ DE NASKIRINA LAŞÊ XWE YA JINÊ



Çima pêwîstiya jinên ciwan bi naskirina laşê xwe heye ?
Gelek jinên ciwan di derbare naskirina laşê xwe de xwedi kêm agahîne. Di civakê de qasî ku mirov bêje tuneye kêm jinên ciwan bedena xwe nas dikin. Ji ber erişên pergala zayendperest jinên ciwan bi ti awayi xwe têr an ji xweşik nabînin. Di jinên ciwan de nakokîyen ku di van mijaran de tên jiyankirin, her roj kûrtir dibin. Li gorî zihniyeta zilam, profîlek li gor bedena jinê hatiye amadekirin.  Lê di rastîyê de ev profîl tu taybetmendiyek xwezayî ya jinê di nav xwe de nahewîne. Ji bo vê jî di kesayet de her dem ji xwe nerazîbûyin tê jiyan kirin. Ger mirov bêje jinên ciwan ji laşên xwe şerm dikin, heta nefret dikin jî wê ne şaş be. Ew hêstên  ji xwe şermkirin û nefretkirinê bi amûrên kapîtalizme her roj kûrtir dibin. Ji ber ku bi rêya medyaya dîjîtal şerê taybet bandora xwe her derê serwer dike. Ji bo vê jî ev rewşa jinên ciwan di her derê nezî hev e. Bêbawer nêzî xwe bûyin, ji xwe heznekirin, xwe biçûk dîtin tê wateya xwe û hebûna xwe înkar kirin. Rewşa jinê ya roja me ya îro çavkanîya xwe hinekê jî ji agahiyên şaş ên di derheqê laşê jinê de belavkirin û giştî kesayeta xwe nasnekirina jinê digre.

## FERQA LAŞÊ JIN JI LAŞÊ ZILAM

Dema mirovek tê  cîhanê , ferqa navbera jin û zilam  di Kromozome wê de diyar dibe. Kromozome jin (XX) ê, kromozome zilam (XY) ye. Bi li hev gerandina DNA'yê di Histon de, şekle kromozom avadibe. Di DNA'an de qodên ku dihêle laşê mirov  têşe bigre hene. Di wan qodan de, organê laş û erkên wan tên qod kirin.  Li gori her organ qodên taybet hene. Li gorî wan qodan laş şiklê jin yan jî yê zilam digre. Laşê jin û laşê zilam hevre di nav hevsengîyê de ye û hevdû temam dikin. Li keleka  erka DNA, hormon jî bi erkekê girîng radibe. Hin hormon hene li gorî laşê zilam, di laşê jin de zêdetirin. Ev hormon dikarin bandorên wek stres ava bikin. Her wiha hormon dihêlin ku laşê mirov wek mezinbûyina pêsêr, dirêjbûyina por şikil bigre. Di laşê jinê de organê vajîna, pêsêr, malzarok yên berçavin. Taybet ev organên jinê, ji organên zilam cûda ne. Cudabûyinên di laş de ne organ bixwe ne, taybetmendiyên organa ye. Pergala zayendperest taybetmendiyên organan gorî xwe şirove dike û ji bo berjewendiyen xwe bikartîne.

# VAJÎNA

Laşê Jinê di dema kamilbûyinê de destpedike xwe biguhere. Laş xwe digîhîne kamilbûyine. Laşê jinê hormonên nû hildiberîne. Bi hilberîna hormonên nû laş dikeve regilê, pêsêrê jinê mezintir dibe, di ser laş de mû û pizik derdikevin. Taybetmendiya jin ya heri ber çav, hêza zarok anîna dinyayê ye. Di laşê jin de mirovek nû tê mezinkirin, xwedîkirin. Gorî zihniyeta baviksalar taybetmendiya jinê tenê zarok anîna dinyayê ye. Ji bo ev feraset were şikandin destpêkê pewistîya me bi redkirina vê ferasete û naskirina organe vajîna heye. Vajîna dişibe gula Orkide. Dû lêve vajîna hene, ê ku organe vajina ji qirejîyan, enfeksiyonên derve diparêze ev her dû lêvin. Taybetmendiya wê adalê wê ne. Vajîna gelek esneke û ev jî rêya zarok aninê hêsan dike. Organe jin û zilam di nav dualîteyekê de ye. Hevdû temam dikin. Di nav vajina de perdeyeki heye ku organê hûndûrin ya vajîna diparêze. Dema tekîli di navbera Jin û zilam de tê jiyin, perda bi navê hymen ya di nav vajîna de diqete. Ji ber qetandinê perdê, xwîn ji vajîna jinê tê. Le ew perde ji ber gelek tiştên din yên wek ketin û qezayan jî dikare biqete. Gorî kes, ew perdeya vajina dikare zû an jî dereng biqete. Ji ber zihniyeta zayendperest ya namûsê gelek jinên ciwan ji milê bav û birayê xwe ve hatine kûştin.

Taybetmendiyek din yê laşê jin regl (adet) e. Dema ku jin her mêh dikeve rewşa regilê xwîna ku ji mal zaroka jinê diherike bi rêya vajîna xwe dide derve. Her meh malzarok xwe ji bo dûcanîbuyinê amade dike. Dema tekîlî neyê jîyankirin an jî hêk xwe bi sperme mêr ranegre malzarok cîhê ku ji bo zarok amadekiriye xera dike. Xwîna ku ji bo cîhê zarokê di malzarokê de kom bûye bi şeweyê regl her meh xwe davêje derve. Ji bo jin bikaribin zarok çêbikin, mecbûre bikeve rewşa regl û tekili bi cinsê hember re deyne. Zarok di nav malzarokê de mezin dibe û ji laşê dayikê de vîtamin û pewistiyên xwe yên laş digre. Di nav 9 mêhan de zarok digihije wê astê ku were dinya yê. Ji rêya vajina zarok ji laşê dayikê qut dibe. Di nav 9 mêhan zarok di nava vê malzarokê de dikare bijî. Ji bo ku zayenda zaroke diyar bibe, kromozom rol dileyze. Vajîna bixwe lamleteki (kas, adale) esneke ev ji dihêle zarok hêsan were dinê. Ji ber zihniyeta baviksalar, serweriya xwe bidomine gelek Jinên ciwan di biçûktiya xwe de tên sûnnetkirin. Mijaren derbare namusa jinê zêdetir tê bawer kirin, ji ber ku zihniyetekê zayendperest hatiye avakirin. Welatên

Afrika û Rojhilata navîn sunneta jinê heta roja îro ji pêk tê. Lêvên vajîna ya jinê hevdû re didrun, ji bo ku jinê ji tekiliyekî cinsî biparezin. Bi sûnneta jinê, çiqas jin bikeve rewsa reglê her car eş dikşîne. Bi we re giredayi li her derê cîhanê iffeta jinê, regl bûyina jinê ji milê civakê de mijareki girtiye.

## REGL

Taybetmendiya jinê ya regl bûyine, di hemû zindiyên 'mê' de heye. Dema jin dikeve rewşa reglê, adale (kase) malzarok fireh dibe û xwîn ji vajinaya jinê diherike. Pirani jin di dema reglbûyine de êş dikşinin. Berîya jin bikeve rêglê hemû hormonên laşê jin tevlihev dibe. Taybet dema jinên ciwan dikevin dema Azbî (kamilbûyin) de. Di wê demê de hestên jinên ciwan digihije asta herî jor û kontrol kirina hêstan zahmet dibe. Laşê jin wê demê hêsten nû diji û nerînên cuda peşdikevin. Di dema Azbî (kamilbûyin) de jinên ciwan cara yekemîn hemberî herkesi, hertişti derdikevin. Di wê demê de redkirina gelek tiştan destpêdike. Ev pêvajo, ciwantiyê dîyar dike. Dema jin regl dibin di nav mêhekî de her hefte hormon di nav guhertinan de ye, ev guhertin her meh xwe dubare dikin. Gûherîna hormon di laş de xwe bi por û pîzikên zêde nişan dide, di warê psîkolojî de jî bi zû acizbûyine, bêsebirbûyin, zû têngbûyin û pir hêstîyarbûyinê ifade dike. Mînak Ostrojen bixwe hormonêk e. Ew hormon enerjî dide. Ger asta Ostrojen bilind bibe asta keyfxweşiye jî bilind dibe, ger Ostrojen kêm bibe acizbûyin, hestiyarbûyin zêde dibe. Bi gişti mirov di kare bêje ku dema regl bûyine de laşê Jin xwe bi gişti nû û zindî dike.

Lê ji ber nasnekirina bedena xwe ketina rewşa reglê psikolojiyekê neyîni di nav gelek jinên ciwan de avadike. Hin feraset hene ku nahêlin jinên ciwan bi laşê xwe re bikevin nav aşitiyekî de. Gorî welatan, zextê hemberî jinê bi ketina rewşa reglbûyine de mezintir dibin. Yek ji wan civaka olpereste. Di baweriya Îslamê de, mînaka destmêja gusûl de diyar dibe ku di nav civakê de çiqas zayendperestî heye û civakê perçe dike. Peyvên wek qirêj û heram ji bo reglê tên bikaranin. Piştî reglê ji bo jin cardin paqij bibe mecbure gusulê pekbîne. Berîya 5 hazar salan jin xwîna xwe ser axê dirijandin lê îro ew xwîna pîroz heram tê hesibandin. Ji bo vê em careke din dibînîn zanista civaki di bin bandora zihniyeta zayendperest de ye.

Qasî ku li ser laşê zilam hatiye sekinandin, ewqas li ser laşê jinê nehatiye sekinandin. Heta gorî zihniyeteki zayendperest pir agahîyên çewt hatine avakirin. Di derheqe kromozoman de bi salane zanebunên şaş hatine belavkirin. Ji alîyê gelek profesor û doxtoran ve dihat gotin ji ber 'Y' di DNA ya jin de tuneye û kromozome jinê ye 'XX' jin hebûnek kêm e.

## PÊSÊR (SÎNG)

Sîng bixwe adaleyeki girîng ye laşê jinê ye. Yek ji taybetmendiyên sîng ya girîng şîr çêkirin e. Jin dikare ji laşê xwe xwarin bide zarokê xwe. Hemu pewistiye zarok yên weki vitamin, mineral dikare bi şîrê dayikê pêşwazî bike. Taybetmendiye xirab ewe ku jin heri zêde ji pêsêrê xwe nexweş dikevin. Jin heri zêde pençeşere sîng re rû bi rû dimînin. Gelek jin neçar dimînin ku pêsêre xwe jê bikin. Girekên mezin yên di pêsêre jinê derdikevin nîşaneyên yekemîn yê pençeşêrê ye. Heri zêde ji stres û hestiyarî pêş dikeve. Di nav hûnerê de, pêsêrê jinê dişibe hinaran.

Bi giştî di nasîna jinên ciwan ya laşê xwe de ji ber zanista pozîtîvist ku qada tenduristiyê xistiye bin serwerîya xwe jinên ciwan ji bedena xwe naskirinê dûr dikevin. Edî wisa lê hatiye ku dema laşe jin tê gotin an sex, an nexweşî an jî zarok anîn tê û ji ber vê pîroz bûyina jinê tene tê bîra mirovan. Di encamde jî di nav civakan de zanebuyin û naskirina laşe jinê tenê di çarçoveya jinokolojiya bi destê mêran ve hatiye hiştin. Ji ber ku jinên ciwan rola xwe ya esasi di nav civak û gerdûnê de nasnakin, dûrketin û nerazibuyînek kûr li beramberî kesayeta xwe dijîn. Di çarçoveya polîtîkayên metakirina laşê jinê de jinên ciwan teşwîqî operasyonên qaşo estetîtîkê tên kirin. Bi pompekirina zayendperestîyê re ji bo ku jinên ciwan bigihijin taybetmendîyên îdeal yê civaka zayendperest berê xwe dide van operasyonên pergalê. Di vir de pîvanê xweşikbûyinê zihniyeta zilam diyar dike. Ji bo vê jinek ciwan çiqas operasyonên fîzîkî derbas bike ewqas ji xwebûyina xwe dûr dikeve û nêzî pergala zayedperest ya zilam dibe. Divê hemû jinên ciwan bizanin bi guhertina laşê xwe, fikre esasî ya kesayet nayê guhertin û derewa heri mezin ya pergala kapîtalist pêşkeş dike jî eve. Bi li berkirina maske û guhertina laş ve zihniyet û nerîna derheqê jiyanê de nayê guhertin. Bi guhertineki laşî ve ji xwe razîbûn pêk nayê. Ev ketina qaliba zilam û zilamsalariyê ye. Ji ber nenaskirina laşê xwe, jinên ciwan rola xwe ji

nasnakin. Bêyi ku bikevin ferqê, dikevin bin bandora zihniyeta kevneşop û baviksalar. Di derheqe vê mijarê de zanista civakî gelek teoriyên çewt peşdixînin. Zihniyeta pozitivist ji nahêle ku taybetmendiyên laşê jinê rast were fêmkirin. Ji bo vê divê jin carek din bi çavê jin li rih û bedena xwe binere û pîvanên xweşikbuyinê careke din ji ber çavanre derbas bike. Divê her jine bi naskirina laşe xwe re zêdetir nêzî xwebûyinê bibe.

## “DIVÊ HER JINE BI NASKIRINA LAŞE XWE RE ZÊDETIR NÊZÎ XWEBÛYINÊ BIBE”





# BEŞA 4

# BI ZANEBÛYINA AZADIYA JIN ŞER KIRIN Û XWE PARASTIN



Di xwezayê de hevsengiyên ewqas xûrt hene ku her tişt di nav ahengekê de ye. Her hebûn, her rûhber di nav peywîrekê de ye û li gor vê peywîrê tevdigerin. Bêgûman ji bo her rûhber bikaribe neslê xwe bidomîne, jiyana xwe berdewam bike li gor pîvanê gerdûnê tevdigerin. Jiber ku yên van pîvanê gerdûnê pêkneyne nikare di nav hevsengiya xwezayê de cîh bigre û yê bi tunebûnê re rû bi rû bimîne. Ev pîvanên gerdûnê ji bo her rûhberî wek xwe têrkirin, xwe zêde kirin û xwe parastine. Êdî her hebûn van pîvanan li gor şert û merc, dem, cîh û pêwîstî bi cîh tîne. Wek hebûnek di vê gerdûnê de ji bo mirovan jî ev peywîr derbasdare. Mirov jî ji bo jiyana xwe bidomînin ji derketina mirovatîyê heta roja me ya îro ji bo bikaribe xwe têr bike, zêde bike û biparêze her di nav lêgerînekê de bû ne. Bi awayêkî xwe parastînê vê em dikarin bibêjin ku karine him xwe xwezayê de him jî di nav xwe de biparêzin û heta roja me ya îro xwe bînin. Ji bo vê jî wek peywîrên din xwe parastin nebe nabe ye. Destpêkê ji bo mirov di xwezayê de bikaribin xwe bidin jiyîn di nav lêgerîna parastinê de bûne.

Bêgûman mirov dikare bibêje ku rêbazên cûr bi cûr jî bikaranîne. Lê ew rastîyeke ku di serdemên destpêkê de ji ber ku hewsengiyek û dûalîteyek di navbera mirov û xwezayê de hebûye karîne heta asteke bi rêbazên xwezayî xwe biparêzin. Ew li ser diyalektîka, 'xwezaya ku me têr dike em çîqas diparêzin, ew jî yê me ewqasî biparêze', pêş ketîye. Ew jî bi giştî zanebûneke û hişmendîyeke dixwaze. Lê bêguman mirov her bi vê hişmendiyê nemane. Di herikandina dirokê re pêşketin jî derketine holê. Taybet bi avabûna şaristaniyê re feraseta dewlet jî xwe dide der. Nexasim her ku  pêşketin çêbûne û feraset hatine gûhertin rêbazên xwe parastinê jî hatine gûhertin. Girêdayî ferasetan êdî mirovan ji bo xwe jî ji hev biparêzin rêbazên nû pêşxistine. Taybet jî bi pêşxistina şaristanî û derketina dewletê ve di navbera mirov-xweza, mirov-mirov û zilam-jin de nakokî çêbûne. Girêdayî van nakokiyan tundî hîn zêdetir derdikeve pêş, bi deme re ev vediguhere pevçûna bi pêşveçûyîna vê jî şer diqewimin. Taybet jî bi derketina hişmendîya dewlet ve êrîşên zilam-xwedayan pêşketine. Bi vê re jî ji alîyên jin-xwedawendan ve him di alîyê fîzîkî ve, him jî di alîyê fikrî vê pêwîstî bi xweparastinê hatiye dîtin. Jiber ku êrîşên heyî êdî dizivire li ser hebûn û çanda dayîk-xwe dawendan ango êdî êrîş li ser hebûna jin pêş dikeve. Ji bo vê jî ji bo jin hebûna xwe, çanda xwe, berhemên xwe, deskeftîyên xwe biparêze her di nav lêgerîna rêbazên

parastinê de bûne. Mixabin her ku jin xwe parastiye jî di her serdemê de li gel êrîşên jin wek hebûn tûne kirine, êrîşên li ser feraseta jin, hişmendî û zanebûna jin jî pêşketine.; ev bi şikestinên cins ve hîn zêdetir kur bûye ku di dîrokê de wek şikestina yekemîn û dûyemîn derbas dibe. Jînên ku heta wî demî bi çanda xwe, bi feraseta xwe ya azadiyê civak, xweza avakiriye û parastîyê êdî ketîye rêwşa xwe parastinê.

Di roja me ya îro de jî dema em lê dinêrin taybet bi serdema Modernîteya Kapîtalîst re êrîşên bi zîhnî yên li ser jin hîn zêdetir kur bûye û li ser her şaneyê belav bûyê. Bi hişmendîya desthilatdarî- dewlet ya sazîbûna netew -dewlet avakirî ve pergala kapîtalîzmê tûnekirina civakê di tûne kirina jînê de dîtîye û bi dirûşma ku “ heta jin tûne nebe civak jî tûne nabe” ve êrîşên li ser feraseta jin, cînsê jin her ku çûyê belavî hemû şa neyên civakê kirine. Taybet bi avakirina civakek zayendperest ve li ser çînsê jin tacîz tecavûz, înkar û îmha pêşketîye. Heta êrîş di roja me ya îro de di asta qîrkirna cînsa jin û hebûna jin de ye. Êdî ev wek feraset di astek wisa de ye ku ji dayikbûnê ve li ser jin lîstokên hişmendîya civaka zayendperest wek feraset ji bo jin tên dayîn. Di pergalê de jin hatîyê astê ku ne bi awayek feraset ne ji bi awayek fîzîkî nikare xwe biparêze. Jiber ku jin ji dayikbûnê ve ji hemû zanyarên jin mehrûm tê hîştin. Heta ji zanebûna zayenda xwe wisa mehrûm tê hiştin ku şûna jin wek zayend di asta pîroz kirin de be, cînsê jin tenê ji bo xwe tatmin kirina zilam, cîhê ku îqtîdara xwe lê pêş dixîne û wek makineya zarok anînê ango bê qûral zêdekirina mirovan tê dest girtin.

Jina kû di pergalê de dixwaze xwe biparêze jî her bi rastî êrîşê tê ku ev carna di asta tacîz-tecawûz, carna bi awayek tûndî, herî zêde jî bi kuştin û qetil kirine re rû bi rû dimîne. Ya ku dixwazê xwe biparêze jî bi her awayî ji her amûrê mehrûm tê hîştin. Taybet jî nasnameya jin hîn zêdetir bi rastî êrîşên zilam- dewletê tê. Taybet ev dema jinek ciwan be hîn zêde bi van êrîşên zilam-dewlet re rû bi rû dimîne. Jiber ku jixwe wek jin îradeya jin nayê pejirandin lê dema ew jinek ciwan be hîn zêdetir bê îrade tê hîştin. Ji ber jin wek ciwan cahîl tê dîtin, nayê esas girtin wek hebûn ya herî zêde bê parastin tê dest girtine. Ji bo vê jî di pergalê de herî zêdê jinên ciwan rastî êrîşên kuştin, tacîz-tecawûz û bi her awayî rastî êrîşên şerê taybet tên. Jiber ku îro pergal herî zêde bi şerê taybet li ser ciwanan dileyzin û bi vî awayî bê îrade tên hîştin. Jinek ciwan ya ku di nav pergalê de ango ketibê pençê pergala kapîtalîst tîşta herî zêde

winda dike îrade û bi vê ve girêdayî hêza xwe ya parastinê ye. Bêgûman ev hêza xwe parastinê jî zanebûn, ketina ferqa hebûna xwe, çanda jin xwedî derketin û hebûna xwe dayîna ava kirine. Ji bo vê wek jinên ciwan emê xwe çawa bikaribin him ji van ferasetan zilam him jî bi awayek fîzîkî biparêzin?


Bêgûman ya ku di destpêkê de bê kirin bûyîna xwedî zanebûna hebûna jinê ye. Divê em di vê ferqê de bin ku heta em zanebûna xwe ya jin nedin ava kirin, em nikarin îradeyek azad jî derxin holê. Gelo em pirsên wek, jin kî ye, cîma jin , jin yê çawa jiyan bike, zanebûna jin çîyê, emê xwe çawa ji feraset û êrîşên zilam biparêzin ji xwe bipirsin, emê bikaribin bersiv bidin? Bêgûman pergala kapîtalîst hemû zanebûnên me ye jin binpê kirîye. Wek jinên ciwan em li rêwşa dayikên xwe binerin emê hin zêdetir vê rastîyê bibinin. Ji bo vê jî ji bo em bikaribin him xwe, him dayîkên xwe, hem jî hemû jinan ji vê pergala qirêj biparêzin dive em nêrînek jin, di xwe de bingeh bikin û li ser vê zanistê em him dikarin feraseta azadiya jin di xwe de ava bikin him jî dikarin bi vî esasî xwe biparêzin.

Heta wek jinên ciwan em xwe nekin hêza zanebûna jin em ne dikarin xwe ne jî dikarin zanebûna jin biparêzên. Lê li gel vê pêwistî bi hin amûrên ku em bikarbînîn xwe û pê biparêzin heye. Bêgûman amûrên şer bikaranîn jî girêdayî zanebûnê ye. Divê em bizanibin em van amûran çima bikartînin. Heta dema jin çek rake û bikevê nav şer de jî pêwîstê bi nêrîna jin û bi estetîka jin çek rake û şer bike. Jiber ku şer jî hûnereke û rastî jî zanebûnekê dixwaze. Bê zanebûn tû nikarî xwe ne di jiyanê de ne jî der şer de biparêzî. Ji bo wê jî xwe parastin zanebûnekê dixwaze Di vir de ev zanebûn jî bi esas girtina zanista Jineolojî û nerînek jin ya Jineolojî di xwe de dayîna avakirine. Ji bo vê jî em dibejin bi zanebûna azadîya jin şer bike û xwe biparêzê.

## “DEMA JIN ÇEK RAKE Û BIKEVÊ NAV ŞER DE JÎ PÊWÎSTÊ BI NÊRÎNA JIN Û BI ESTETÎKA JIN ÇEK RAKE Û ŞER BIKE”

# BEŞA 5

# LI HEMBER XWEDAYÊN MÊR, BÛYINA XWEDAWENDEK SERHILDÊR: AFRODITBÛYIN



Di mitolojiyê de Afrodîtbûyîn li hember pergal û çanda serwerî ya zilam ya 5000 salî qirîn, tekoşîn û ji nû ve zayina hemû jina ye. Rêber APO ji bo jina azad avabibe xwe gîhandina xwedawend Afrodît datîne pêşiya me. Jînên bibin Afrodît xwe ji koletiyê xelas dikin û xwebûna xwe bidest dixin. Afrodît kîyê? Rol û mîsyonek wê ya çawa heye? Çi temsîl dike? Di mîtolojî de xwedawendên em behsa wan dikin ji bo jinên îro çi îfade dikin? Ji bo em bikaribin bersiva van pirsan bidin divê em xwedawendan nasbikin. Di dîroka mirovahî de jî îspat û nîşaneyên xwedawendî ji yên yêk xwedayî zêdetirin. Xwedawend nirxên civakê û mîtolojîyê didin dîyarkirin. Jin ji pêvajoya neolîtikê heta roja me ya îro di nav civakê de xweşikbûn avakirîye. Ji bo vê jî civak keda jinê û kombuyîna nirxên hevpar îfade dike. Ji bo vê divê em jinê ji rastîya civakê qut negirin dest. Di pêşengtîya jinê şoreşa çandiniyê, civakbûyîn, kollektîfbûyîn, bi xweza re yekbuyîn pêşdikeve. Ji ber dayik- xwedawend pîvanên jiyanê di xwe de dihewîne. Wexta em dibêjin jina xwedawend divê tenê zarok anîn neyê bîra mirov. Pênc hezar salin desthilatdariya zilam û çanda zilamsalar nirxên ku jin avakiriye ji cewherê wê dur xistiyê.

Di wê mijarê de xwedawend Afrodît mînaka herî bi êş ya serî rakirîna li hemberî zilamsalariyê îfade dike. Lê hebûna Afrodît roja me ya îro de berovajî tê nirxandin. Afrodît di mîtolojiya Yunaniyan de wek xwedawenda evîn û xweşîkbûyînê tê pênasekirin. Li gor vê mîtolojiyê bi xwedayê hûnerê re dizewice û ev zewac ne bi awayekî serîtewandinê ye. Li hember zewaca ku koletiyê avadike derdikevê û hevjîyana azad esas digre. Ev sekna Afrodît hîşmendiya azadî û jinê dide dîyarkirin. Afrodît xweşikî û evîna xwe bi hûnerê re dike yêk xwe li ser van taybetmendiyan îfade dike, civakîbûyinê pêşdixîne. Jin di roja me ya îro de wek obje tê dîtin û ev rastîya hişmendiya zilamsalar nîşandide. Rastîya jin jî vî alî tê berovajîkirin. Afrodît jî her tim berevajî tê behskirin û şîrovê kirin. Çawa Afrodît şaş û berovajî tê nîşandayin dixwazin bi vî rengî nêzî jinên ciwan jî bibin. Dixwazin evîna ku ji alîyê desthilatdariyê ve hatiye berevajîkirin bi jinên ciwan bidin pejirandin. Ev jî tekakesbûyin, seransertî û

xweşikbuyinê bi awayek fîzîkî girtina dest avadike. Tenê ji bo zilaman jîyana xwe domandin pêşdikeve. Jinên ciwan ji bo evîna azad û evîna gerdûnî pêşbixin pêwîstê kevneşopîya ku koletîyê avadike derbasbikin. Ev jî tekoşîna li hember hişmendîyê zilam îfade dike. Rastîya Afrodît derxistîna ronahiyê û bilindkirina şerê azadîyê çalakîya herî xweşik e. Afrodîtbûyin şerê gihîştina evîna raste. Nêzîkatî ya azadîyê, şerê gihîştina xweşîkbûyinê nasnameya jina azad e. Evîna di serdema neolîtîkêde tê jîyîn evîna rast e. Evîna ku ji alîyê pergala kapîtalîzmê hatiye avakirin jî ji manewîyatê qut û li ser berjewendiyê ye. Her wiha bi şerê taybet ku li hember jinê pêşdixîne re hewldide jinê wek amûr bikarbîne. Jin jî manevîyatê durxistin, ji hêst û fikrandinê durxistin dihelê ku ew jin ji civaka xwe jî durbikeve û tenê bibe amûrek ku zilam xerizeyên xwe tatmin dike û desthilatdarîya xwe dixe meriyetê.

Em di karin rastiya zilam di mînaka şerê Troya de bibînin. Di vê mitolojîyê de xwedawend Athena nirxê maddî hildibjêre û Afrodît jî evînê hildibjêrê. Afrodît di vir de berovajî tê şîrovekirin. Ya rast ewe ku Afrodît di şerê Troya de gel diparêze. Wexta derbasî Romayê dibe ji Venûs bawer dike. Vê baweriyê dide berdewamkirin. Di vir de jî tê ditîn feraseta zîlamsalar nirx nade heqîqeta civakê û rastîya evînê. Afrodît xwedayê şer Ares re evînek jîyandike û pîştre zarokek wan ya nêr çedibe. Ev zarok bi tirs û dehşete tê îfadekirin. Heman demê bi lezbûyînê tê pênasekirin. Di kêsayet û cewhera jinê de hevsengiya evin û şer sentezek çedike. Em dikarin bêjin şerê evînê di heqîqeta jînê tê avakirin. Afrodît li hember giştî tabû û darîzandinên civakî sekiniye. Hemberî kevneşopiyên civakî evîna xwe hilbijartiye, dîrokê de wek xwedawenda ku xwebûna xwe herî zêde parastiye tê îfadekirin. Rêber APO jî Afrodît weke jinekê 'Paqij maye' ifade dike. Wexta em dibêjin Afrodîtbuyîn pîvanê jina azad diyardibe. Li hember desthilatdarîya zihnîyeta zilam tenê evînek mîna ya Afrodît ku ji bo azadî şer dike û teqez digihije encame dikare serkeftinê bidest bixe.

# BEŞA 6

# DI SERDEMA KAPÎTALIZMÊ DE MODA Û HESÛDBÛYÎN



Di sedsala 21. de yêk ji amûren herî bi bandor yê kapîtalîzmê sektora moda ye. Bi rêya moda serwerîya xwe li ser civakê û bi taybet ser jinên ciwan ferzdike. Weke tê zanîn beşa herî zêde di nav civakê de tê hedefgirtin jî jinên ciwan in. Pergala kapîtalîst herî zêde xîtabî jinên ciwan dikê. Ji bo ku jinên ciwan rola xwe ya esasî nav civakê neleyze kapîtalîzma zayendperest rojane bernameyên taybet ser jinên ciwan pêşdixin. Jinên ciwanên ku bi nasnameya ciwantîyê her tiştê jîyanê lêpirsîn û lêkolîn dike, xwedî iradeye, gihîştîye wê merhaleya ku hemû taybetmendîyên xwe winda bike û bibe koleyê pergalê. Bandora şerê taybet dihele ku jinên ciwan bê armanc jiyan bikin. Her rola ku jê re tê dayîn bê lêpirsîn pêktîne. Çawa ku pîşesaziyê de objêyan dişînin fabrîqayan, sektora moda jî bi wî awayî jinê li gorî pîvanên xwe yên xweşikbûyînê ji nû ve çêdike. Moda bixwe tê watêya " nû" ji peyva modern tê. Lê her çiqas nûbûyîn û pêşketinê îfade bike jî pêşketina wê hêza fikir paşde dibe. Mînak rengê ku îsal tê ecibandin salek din di sektora moda de nayê qebûlkirin. Sektora moda taybet bi pêşkeşkirina bi cil û berg re eleqedar dibe.

Ger mirov rêwşa jinên ciwan bişopînê mirov dibînê ku hatine asta bibin amûra desthilatdarîya zayendperest. Moda bixwe maşînaya herî xûrt ya yekdestîya pergala kapîtalîst e. Ji ber vê jî global e. Bandora li ser jinên ciwan li her derê wekhevdû ye. Ji ber li gorî demsalê bernama xwe dîyardike. Rêklama xwe bi hefteya moda ve pêktîne. Ev hefteya moda ji alîyê piranî jinên ciwan ve tê şopandin. Li gorî van pîvanan ji derdor tê ecibandin û esasgirtîn. Bi nîqaşên jinên ciwan de tê dîtîn ku jinên ciwan di jîyana takekesî ya moda, dijital medya herwisa de hatine sînordarkirin. Pergala kapitalist van qadên jîyanê wek polîtîka, şer hwd. ji bo jinên ciwan gûncav nabîne heta tê gotin ku kesayet neyînî bandor dike. Jinên ciwan di çarcoveya ku pergal dîyarkiri de tên bicihkirin. Ger mirov derheqe jîyanê û civakê ji jinên ciwan pirs bipirse bersiv naye girtin. Lê ger mirov derheqê kesayetên navdar, moda pirs bipirsê bersivên rast tên girtin. Di jîyanê de qadên tên amadekirin li gorî siyaset û plansazîyên pergalê tên dîyarkirin. Qadên mîna City Center, kafe, dijital

medya ku sînorê jîyanê hem ji aliyê mejî hem jî aliyê fîzîkî ve bandor dike tên zêdekirin. Ger ew qad werin bikaranîn, wek azadî tê hesibandin. Çawa ku bûrokratêkî di sazîyê dewletê de cih digre, çawa ku dayîkek di mal de tê tengkirin, jinên ciwan jî nikarin derkevin derveyî wan qadan. Her wiha wek pêlîstikek ku tê xemilandin û peşkeşkirin, jinên ciwan jî ve rêwşê jîyan dikin. Mêjiyê fikrandin û zanebûnê li gorî moda şikil digre û ji ber vê jî mafê axaftinê û lêpirsînkirinê heta bi giştî jiyankirinê tûneye. Ji rewşa subje ketiye rewşa onjebûyina jiyanê. Berê jin jiyanê bandor dikir, îro ew ji milê her kesî ve tê bandorkirin. Jiyan bê wate bûyê, ji milê malbat, zilam û pergalê ve her di nav xweparastinê de ye. Ji roja dayikbûyinê rola wê tê dîyarkirin. Di vê rewşê de jinên ciwan nabînîn ku jiyana wan ji derve tê bandor kirin û difikirin ku ew bi îradeyên xwe bixwe biryaran xwe digrin. Ji ber sînorê pergalê nayê dîtin, derbaskirina wê jî pêk nayê. Ji ber wê jî alternatîfa jîyanê nayê dîtin. Her çiqas nakokî werin jiyankirin jî alternatîfa jiyana malbatê, pergala kapîtalîst ya zayendperest e. Nakokiyên tên jiyankirin jî bi zîhnîyeta liberal û azadiya sextê tên bicîhkirin. Ji ber wê asta êrîş û înkarê nayê ferqkirin. Di nav jiyanê de jî her bi ajo û xwestekên şexsî tê tevgerandin. Ajo mirovan kontrol dike û bi vê tevgerandin çedibe. Ji ber tarzê jiyanê ya liberal avadikê bandora pergalê pir kûr e. Ji ber jinên ciwan jî dixwazin bên dîtin, esas bên girtin her jinek ciwan dixwaze jiyana xwe bîşîbîne jiyana kesayetek navdar.

Di encama vê rewşê nav jiyanê de asta serkeftina jiyanê pergal bixwe zelal dike. Ger pîvana moda daniyê pêkbîne gerek zayif, direj, sportîf be, asta zanebûn û fikran din ji divê kêm be. Bi vî awayî jina yek tîp tê avakirin. Jinên ciwan ji xwe mecbûrî vî tiştî dikin. Ger ev pîvanên pergalê neyên bicîhanîn politikaya kapitalizme ya “Ger tû nekî yên ji tê baştir bikin hene “ dikeve dewrê. Di nav reqabetê de mirov xwe ji bîr bike jî ji ber vê rewşê hesûdî pêşdike ve, xwe biçûk dîtîn, bê hêz dîtîn pêşdikeve. Ji tîrsa ku neyê ecibandin an xweşik neyê dîtin ketîna qaliban pêşdikeve. Ji heft salî heta heftê salî her jin vî tiştî jiyan dike. Jinên ciwan de xwe şibandina derve pir dîyardi-

be, lê xwebûna xwe dîtin lêwaze. Di vê mîjarê de zayendperestî rolekî bi bandor dilîzê. Polîtîkayên taybet ji bo bandorkirina jinên ciwan pêşdixîne. Jinê bi zayendperestî ve dixe bin destê xwe bi giştî hebûna wê kontol dike. Ji ber wê mûdahalêyên ser jiyan, kesayet, fikir heta laşê jinê astekî bilind de ye. Ger jinên ciwan van erîşan red bikin wê encamên erenî werbigrin.

## "GER JINÊN CIWAN VAN ERÎŞAN RED BIKIN WÊ ENCAMÊN ERENÎ WERBIGRIN"






# BEŞA 7

# ŞIFREYA ZAYENDPERESTIYÊ: MALBATGERÎ



Di rojameyî iro de malbatê heyî di kesayet û civakê de çi dide avakirin? Berîya her tiştî divê bê zanîn heta em saziya malbatê çareser nekin emê nikaribin xwe jî avabikin. Ji bo wê pewîstî bi dahurandin û naskirina malbatê heye. Ji bo ku em heqîqetê rast pênasê bikin divê biçin destpêka civakîbûyinê ya serdema neolîtîkê ku li derdora dayik - xwe dawend de hatiye avakirin. Her çiqasî malbat bi xwe weke qlan neyê diyarkirin ji nezî wê ye. Malbat di nava qlanê de sazîya ku pêşî cuda dibe ye. Qlan di navbera 25-35 kesan pêk tê. Ji bo mirov hebuna xwe ber dewam bike dîrokê de pêwîstî bi kombûyînê hatiye ditin. Malbat tê wateya mal-mûlk yanî têgîneke maddî tê pênasekirin. Di heman demê di zîmanê Sumerî de Bat-bet tê wateya cihê ku zêdetîrî 2 kes jiyan bike. Di zîmanê Erebî û Sami de heman wateyê de ye. Civakbûyina despêkê li derdora dayîke kombuye û ev ji bi xwe re pivanên exlaqî yê cîvakbûyinê avakiriye. Destpêkê tenê malbata dayikê wek xaltîk, xwişk, xal dihate nasîn. Tabûyên ku ji alîyê dayîk ve wek pîvanên pîroz dihat ditin hebûn. Yêk ji van tabûyan xwîn nerijandin, yêk ji zayendî bi awayek yoz (bê exlaqî) jiyannekirin e.

Di vê civakê de zarok anîn tîştê herî pîroz e. Ji bo vê jî rol û misyona jinê di her milê de bandorker bû. Jin bi adalet û parvekirina xwe ve wek xwedawendek dihat qebulkirin. Piştî şoreşa gund û cotkariya texmînî di salên 5000 (B.Z) de pêşketina otorîtêya hiyerarşik ya di bin serwerîya zîlam de ji dema malbata bavîksalar despêdîkê. Zilam serwerîya xwe li ser jin û xwezayê pêktine. Bi demê re jin wek milkê xwe dîtin peşdikevê. Dêndîka dewletê ya despêkê li ser malbatê hatîyê vesazkirin. Dewleta yêkem a baviksalarî jî di ziguratan de hatîyê despêkirin. Li vê pêvajoyê koletiya jin hîn kûr û berfirehtir bûye. Her çiqas berxwedaniya jinê di astekî herî jor de be jî zîhnîyeta desthilatdar ku jînê wek milk û namusa xwe dibîne pêş dikeve. Bi derketina olên yêkxwedayî re ev yêkkûrtir bûye. Çawa ku zilam desthilatdarî û zorê li ser Jin dimeşînê dewlet heman tiştî li dijî tevahî civakê pêktîne. Zilam jî di vê rewşê de dibe koleyê koleyan. Di vir de mirov dikare bêje ketiye bîra ku bi xwe koleye. Malbat di serdema îro de bûye bingeha desthildatdariya kapitalizmê. Bi belavbûna

sistema kapitalist jin rewşa koletîyê bêhtir jiyandike. Têkiliyên jin û zilam tenê li ser esasê ajoyan tê avakirin. Hovitîya herî mezin di nav malbatê de li ser jin tê ferzkirin û keda jinê ya nav jîyanê de avakiriye ji aliye mêr ve hatîyê bidest xistin. Desthilatdariya dewletan zilamê di nava malê de weke otorite erkdar kiriye. Bi vî awayî malbat anîne rewşekê ku bûye amurê herî giring ya şêwekirina yêkdestdarîyan. Ji şebekeyên sermaye û serwerîyê re her tim mirovan dixin kole, serf û karker, esker û ji bo xwe bikartînin. Ji bo wê giringî dan û malbatê pîroz dîtin.

*"Di bihevrêbûna jin û meran de nezîkatîya ideal ewe felsefeya azadiyê ya bi civaka exlaqî û polîtîk ve giredayî esas bê girtin. Malbata ku di vê çarçoveyê de veguhere wê garantîya herî teqez a civaka demokratik be. Wê ev yêk jî tekîliyên bingehîn ên şaristaniya demokratik bin. Ji hevaltiya hevjintî ya fermî wêdetir hevaltiya xwezayî giring e." – Rêber APO*

Êdî di şexsê jin de li ser civakê zihnîyeta zilamsalar hatiye serwerkirin. Têkîliyên dayîk û bav bandora xwe li ser zarok dide avakirin. Mixabin ev zaroka ku mezin dibe û civakê bi rêvedibe jî bi heman rêbazan ji bo zîhniyêta baviksalerî tê amadekirin. Zarok bi xeyalên pir erzan tên mezinkirin. Li gor pîvanên malbatê eger zarok ji her tiştî re bêje erê ewê bibe zarokê herî baş. Di kesayeta jinên ciwan de tiştê ku tê avakirin durketina ji zayenda xwe ye. Jinên ciwan ku vê dûrketina jixwe jîyan dikin hertim xwe dispêre bav yan ji birayê xwe. Ev jî dihelê ku di jin de jixwe bêbawerî pêşbikeve û zilam wek parastin bibîne. Jinên ciwan ên bê îrade jî tenê ji bo xizmeta zilam bike tên mezinkirin. Jinên ciwan ji zaroktîyê heya ciwantî ji bo zilam tên amadekirin û heta zewacê jî di nav malê de wek mêvan tê dîtin. Jin heman demê wekê amûra reklam, rezêfilm jî tê bikaranin. Ji bo zewacê tên amadekirin û êdî tenê di çarcoveya van xeyalan de jiyan dike. Jinen ciwan ji desthilatdariya di nav malbatê de acizin lê bele şaşîtiya herî mezin ku dikin ewe çareseriyê dîsa di zilam de digerin. Ev rewş di bin navê azadiyê de xwe xapandin e. Zîlam jin wekê namus digire dest. Ev jî jin dike weke milkê taybet û bê nirxbûyinê pêşdixîne. Taybet li Kurdistanê bêkesayetbûyin avadibe û li ser jin her roj

polîtîkayên tecawûzê peş dikevin. Ji bo jinên ciwan bibin xwedî îrade û nasnameya azad pêwîstê rastiya malbatê bibînîn û xwe bi îrade bikin. Malbat ji holê rakirin ne mumkine lê malbatek demokratik dikare were avakirin. Ev jî bi pêşxistina hevjiyana azad pêkan e. Li hemberî van pirsgirêkan sekinandin û rêbazên çareseriyê gerandin yekemîn di bin berpirsyariya jinên ciwan de ye.

## "JİNÊN CİWAN Jİ ZAROKTÎYÊ HEYA CİWANTÎ Jİ BO ZİLAM TÊN AMADEKİRİN Û HETA ZEWACÊ JÎ Dİ NAV MALÊ DE WEK MÊVAN TÊ DÎTİN"





# BEŞA 8

# JIYAN BI ÇANDA JINÊ BEDEW DIBE



Çand û hûner cihana hîşmendiya civakê diyar dike. Fikirandin, ecibandin û exlaq wek her sê mijarê wê yên bingehîn in. Çand nirxên ku mirov avadikin zivirandina tarzê jiyanê ye. Di nav wê de hemû berhemên maddî û manevî tê hewandin. Jiyan bi xwe çand e, çand bixwe jî jiyan e. Yê ku dihelê ew çand berdewam bike jî bi ziravî yek mezekirin re wê zivirandina hûnerê ye. Tevahiya dîrokê de bi vî şewazî xîtabî rihê civakê kirinê. Çawa ku dîrok dîyardeyekî zindîye, çand jî dîyardeyekê ku manevîyat, nirx û exlaqê civakê diyar dike ye.

*“Şoreşa neolîtîk di hûner de rê li ber şoreşê vedike. Pîştî xizkirinên hêsanyên şikeftan hêmû serdem bi fîgurên dayîk-xwedawendan ve tijî dibe. Serdemên hûnerî yên ewilî jî ev fîgurin. Wek koka tîmsalkeriyê ye.” -Rêber APO*

Ger em dema bihûrî mêze bikin emê bibînîn ku civakan tarzê jiyanêû tiştên pîroz dîtîne bi rêya pêşxistina hûnerê gîhandine heta roja me ya îro. Bi hûnerê li ser diwaran û keviran wêne çêkirine û gîhandine heta roja me ya îro. Em ji van wêneyan dikarin dîroka xwe şîrove bikin û hişmendiya wê civakê şîrove bikin. Dema em serdema civaka xwezayî mêzedikin em dibînin ku jiyan derdora jinê de tê avakirin. Ew şîroveya me bingeha xwe ji fîgûrên heyî digire. Ew fîgur me dibe nerînekê wisa ku ew serdem li derdora xwedawendan de dihat jiyankirin. Fîguran de jin û xweza piranî di nav yekitîyekê de hatine dest girtin. Piştî ku çînayetî û desthilatdarî pêş dikeve em dikarin bêjin çand û hûnera jinê hêdî hêdî hatiye berovajî kirin. Bi zîhnîyeta dewlet-zilam re hişmendîyekî maddî hatîye pêşxistin. Pîramîdên Misir’ê, zîgûratên Sûmer’an, mabedên Hînd’an û bajarên binerd yên Çîn’ê mînakên berbiçav yên vê çanda maddî ne. Mirov ji cewherê wê qutkirin, hem mîlê manevî hem jî milê rûhî de cewherê mirov vala kirin armanca esasî ya hêzên desthilatdare. Dixwazin van politikayên xwe jî herî zêde bi rêya çandê pêk bînin. “ Kî çi vexwe, çi biaxive, çi li xwe ke, çi mêzebike” her tîştî diyar dike. Van polîtîkayan taybet bi rêya telefon, televizyon û medyaya cîvakî dide meşandin. Di bin navê çandê bê çandbû-

yinê pêşdixînîn. Ji ber ger nirxên civakê bên berovajîkirin ewê bikaribin civakê bi dest bixin. Gerek em tû carî jibîr nekîn ku desthilatdarî xwe berdaye nav her şaneya cîvakê. Taybet di mile çandê de êrîşek gîran tê meşandin. Ger em mînak bidin di rêzefîlmên ku tên pêşkeşkirin de dîmenên erotîk pir zêdene. Dir vir de em dibinin xwêstêk û hewldana civakek ajoyî pêşxîstin heye. Ev politikaya qirêj taybet li ser jinên ciwan tê meşandin. Ji ber jinen ciwan ji alîyê civakê ve wek pêşeng û pêşeroja civakê tên dîtîn ewqas êrîşan re rû bi rû dîmînin. Di mîlê çand de êrîşî jinên ciwan dikin û dixwazin di jinên ciwan de çandekî oryantalist an jî postmodernîst pêşbixînin. Ji bo vê hinêk kesayetan wek model derdixînin pêş û ji wan kesan re jî dibêjin hûnermend. Dihêlin ku her ciwanek xwe bişîbînin wan kesayetan. Ciwan jî van kesayetan ji bo xwe wek model dibinin û encamê vê de ev rewş jî dihêlê di civakê de yêk tîpî bê avakirin. Mirovatî despêkê di axa Mezopotamya de hatîye avakirin, çanda herî qedîm û pîroz li Rojhilata Navîn hatîye afirandin. Di roja me ya îro de dixwazin vê rastîyê berovajî bikin û ji bo vê wiha dibêjin: “Yên herî bi çand rojavayê cîhanê ye, yên herî paşketî jî Rojhilatanavîn e”. Hêzên desthilatdar vî fikrî pêşdixin û herdem qîrkirinek çandî li ser gelen li Rojhilatanavîn didin meşandin.

Rêber APO di paraznameya xwe ya bi navê “Di nav Pencên Qirkirina Çandî de Parastina Kurdan ” de dîyarkir ku netewa Kurd ji qirqirina çandî, ji qetlîam û her cûre zordarîyê hatine derbaskirin. Di vê rewşê de jî yê ku hişt ev gel heta roja me ya îro hebûna xwe biparêze çanda qedîm û pîroz bû. Rêber APO gelê Kurd û Rojhilatanavîn ji nav pencê qirkirinê rizgar kir. Çanda herî rast cewhera xwe jîyan kirine. Ger ku em bixwazin hinek netewan mînak bidin; Gelê Suryanî rixmê ku ji qirqirinek dijwar debas bune bi parastina çanda xwe hîn jî hebûna xwe berdewam dikin. Ji alîyê çandî ve hûnerek kûr afirandine û berhemên mayînde hiştine. Gelê Êzidî, gelekî ji 72 fermanan derbas bûne lê gelê herî qedîm yê Rojhilata Navîn e. Gelek netew hene ku rûpelên rêş yên dîrokê de wenda bûne. Ger civakek çand û ziman neafirine ewê jî tunebûne re mehkûm bibe. Dîsa Rojhilatê Kurdîstanê di stranan de xwedî çandekî xweser

û qedîm e. Gele Kurd her tim zor û zehmetiyên ku jiyan kirine piranî bi dengbêjî anîne ser ziman. Çarna jî wekî çirokekî ji zaroka re gotine û ev jî hîştîyê ku ew hişmendî bi rêya çand her berdewam bikin. Li erbanê xistina jinê estetîk bûyîna jinê nişan dide. Jina şoreşger Şehîd Mizgîn (Gurbet Aydin) ji bo jinên ciwan pêwîstê bibe mînaka çand û hûnerê. Çîroka Mem û Zîn ya ku Ehmedê Xanê derbasî nivîsê kiriye destana ku tekoşîna gele Kurd û evîna Kurd ji bo ax û welat anîye ser ziman. Destana Derwêşê Evdê çanda qehremanî û egidîyê nîşanî me dide. Gelê Kurd bi çandekî qedîm her gav jiyana xwe berdewam kiriyê. Taybet yên ku wê çandê bide berdewam kirin û parastin jinên ciwan in. Divê wek jinên pêşeng yê civakê rêgeza sereke ya ilmê jîneolojî etîk-estetîkê de xwe kûr bikin û çand û hûnera xwe biafrînin. Li hemberî qirkirina çandî pêwîstê em çanda xwe de israr bikin. Bi fikir, bi cil û berg, bi her rengî pêwîstê em çanda xwe jîyan bikin. Bi vî awayî em ji bo civaka xwe rolê xwe yê pêşengtîyê bîlîzîn.

**“JINA ŞOREŞGER ŞEHÎD MIZGÎN (GURBET AYDIN) JI BO JINÊN CIWAN PÊWÎSTÊ BIBE MÎNAKA ÇAND Û HÛNERÊ”**



Ş.MIZGÎN

# BEŞA 9

# JÎNGEH



Dema wek hebûnek em dixwazin ji bo mirov pênaseyek bikin em destpêkê cûdatîya wi ya zindîyên dîtîr û hêza wê ya fikrandinê tînîn ser ziman. Yê ku wê cûda dike hêza fêmkirin û watêdarkirina kûr ya bi hevsengîya fikir û vîcdan derketîyê hole ye. Di esas de ji bo mirov xwe bigîhine wateya gerdûnê, heqîqeta gerdûnê bersiva pirsa mirov ji bo çi heyexwedî girîngiyek mezin e. Ji bo vê çalakîyê pêkbînîn jî pêwîste mirov te kiliya di navbera mirov- û hebûnen dîtir de bidahûrîne û bi vê re girêdayî pêwîstê xwe ji hebûnên dîtir razber neke. Dema ku em giredanbûyina mirov bi hebûnên dîtir re digrin dest, feraseta herî nêzî rastêqîniyê. "Anîmîzm" û 'Kuantum' esas girtin pêwîst dike. "Anîmîzm" ango zîndekarî dîyar dike ku hemû tiştên di gerdûnêdene zindî ne. Dema ku em wê dîyardehê dibîhisin bertekê me yê yekemîn hemû maddêyên ku em dibêjîn zindî nîne ji cerîbandinan re derbas dikin. Em kevirek digrin şêwazêkî xwe bawer dûr diavejin guliyêkî darê yê hîşk qut dikin û tiştên nav jîyanê de em bikar tînin ji ceribandinan derbas dikin.

Tiştê kû em digerin çi ye ? Ji ber kû me pîvanê zindîbûyînê tenê wek dema eş tê kişandin refleksen parastinê nişandayîn diyar kiriye tenê hin nebat, ajal û mikro organîzma ji vê ezmûna ceribandina me derbas dibin. Derveyîvan tu madde ji ceribandinên me derbas nabin. Lê dema mirov tenê bi vê hişmendîyê tevbigerê ji tê ditin ku nav şaşitîyên çawa de ne. Dengê ku kevir û dar derdixe, maddeyên ku em bikartînin de guhertinên şiklî hemû dîyardêyên zindîbûyine ne ku me wek refleksên parastinê diyarkiriye. Hevsengîya bi heybet ya gerdûnê rewşa madde ya herî herikbar ango enerjî re pênase kirin, wê pênaseyek rast be. Ger ji bo zindekariyê rêgezêk bê dîyarkirin pêwîste ew gûhertin û vegûhertin be. Ji ber ev rewş berdewamîya enerjî îfade dike. Wek Rêber Apo jî dîyar dike " mirov xulaseya gerdûnê ye". Ji bo vê dema mirov tê mêyzekirin tê fêmkirin ku çima her rê digîhîje mirov. Mirov bi taybetmendîyê xwe yê fêmkirin û watedar kirine re di asta ku ji gerdûn û hemû hebûnan re bibe bersiv de ye. Di bingeha armanc û lêgerînan de li ser şopa heqîqetê de meşandin çalakiya herî bi watê ya mirovatiyê ye. Lêgerîn me digîhine

heqiqetên ku em jê re dibêjin sirrê gerdûnê. Mînak tiştê ku wek tabûya civakî îfade dikin “negûherîna kevir” li gor lêkolînên hatin kirin ji şert û mercên xwezayî bandorbûyina kevir eşkere hatiye dîtin. Lê wek mirov kêmahiya me ew e ku em guhertinê dikin nav sînoran wek çalakîyek tenê giredayî mirov pênasê dikin û dema nav jîyanê de em pirsgirêkan re rû bi rû dimînin di nav bertekên xwe yên şexsî de vedişerin. Gûhertin her dem xwe domandine û li gor cîh û dem cûda pêş dikeve. Dema ku tê gotin xwedî mêzekirinek gerdûnî bûyin tiştê ku tê xwestin mêzekirinek ku di xwe de sînordar namîne, xwe derbas dike ye. Bi pêşketina desthilatdarî re feraseta mulkgerî ya hemû gerdûnê tehdît dike bûye sedama şer û pevçûnan .Di roja me de piranî nîqaşên ser jîngeh tê me şandin 90% li ser pirsgirekên jîngehê ne. Xwasteka pergala kapîtalîst ya kârê zêde bidestxistînê hemû tiştên derdikeve pêşîya xwe wek buldozer diqelqîne bi wî şêwazî hewl dide berdewamiya xwe mayînde bike. Pişêsazîya kârê zêde ya ku ji pergala kapîtalîzm û sermayedaran re xizmet dike endustrîalîzm re zirarê mezin yên ku neyên telafi kirin ji xwezayê re tên dayîn. “ Zagonên malê” ku aborîyê îfade dikir û ji bo pêwîstîyên malê bên bicihanîn hatibû avakirin niha bûyê şêwê girtina çanda serfkarî ya pergala kapîtalizm. Aborî, aboriya pêwîstiyê nîne, aborîya derveyî pêwîstîyan e (serfkarî).

Cîhê ku çerxa aboriyê lê tên avakirin zirar dide xwezayê û bi wî şêwazî piranî zindî tên jehrîkirin. Ji bo qirejiya fabrika pêwîste mirov maliye cuda bike lê ew risk ji alîyê sermedaran ve berçavan nayê girtin. Xweza ji bo tirsa pere wendakirinê ya sermayedaran bi qetlîaman re rû bi rû dimîne. Wek fonksîyonek herî jiyanî yê mirovbûyinê nefes girtin bi oksîjêna ku ji xwezayê tê peyda kirin pêktê. Xwarin xwarin, xwe bi cîh kirin, xwe parastin hemû tiştên ji bo berdewamiya jîyanê pêwîst dike ji xweza tê peyda kirin. Sedema ku ji xwezayê re tê gotin dayik jî ji vir tê. Wek dê anîmîzim nîşandide ku civaka xwezayî de mirov hember xwezayê di nav seknek cawa dene. Hember xwezayê rêzdayînek ewqas mezin heye ku vê rêzê wekî olek qebûlkirine. Di vir de nêzîkatîya jin beramberî xweza dîyare û bi bandor e. Jin tenê jî xwezayê nagre, heman

demê de hevparîyê û tene tiştên ku berhem dayînêdê keda wê heye xerçkirine ji bo xwe esas digre. Jin li hember destxistina berhema neheq rehenda “kedê” bi pêşxistiye. Bi wi şêwazî tekilîya di navbera jin û xwezayê bi hêz bûye. Nêzîkatiya jin ya beramber xwezayê wek nêzîkatiya beramber zaroka xwe ye. Di civaka xwezayî de aborî ji aliyê jinê veşartina hin nebatên ku xirab nabin re pêkhatîyê. Berhêmên kû zêdeyî pêwîstîyan yên û tê gotin “ ber hêmen zêde” di cejna de aliyê dayîk xwedawend ve hatîye belavkirin. Bi vî şêwazî civakbûyîn derdora yekparebûyîna mirov-xwezade pêkhatîyê. Ew kevneşopî hîn jî berdewam dike. Bi demê re bi pêşketina çînayetî re hatîyê xwestin ku kombûna hêz û civakbûyinê bê parcekirin. Berhemên zêde navendekî de hatîye komkirin û bi vî şêwazî hatiye xwestin pêşiya parvekirin û civakbûyinê bê girtin. Dema parvekirin ji holê rabûye jî kesên xîzan û pedîviya wan bi alîkarîyê heye zêde bûne û vê jî bi xwe re xulamtiyê avakiriye.

Ji bo mirov bikaribin jiyana xwe ya bîyolojîk berdewam bikin serî li vê koledariyê tewandine û pejirandine. Dema em koletiya roja me ya îro mêze bikin emê bibînîn ku hinek veşartî hinek jî xemilandî û ev rewş hatiye asta koletiya dildar. Çawa ku jin ji bo çekirina amûrên şer destxistina maddeyên ham wek xulam tê şixûlandin li ser xwezayê jî metîngeriyek kûr heye, heta metîngeriyek ewqas kûrê ku derfetê xwezayê ya xwe nû bike jî nemaye. Ji ber serfkarîya zêde û şaş ya berhemên xwezayî cihan germahîya kurevî ve rû bi rûyê. Niha tenê wek xeterîyek tê ifade kirin le tê diyar kirin ku piştî sed salan wê pirsgirêka ava şîrîn derkeve.

Navenda hemû pirsgirekên ku hem di aliyê jin de derdikevin hem jî di aliyê xwezayê de derdikevin modernîteya kapîtalîst e . Hem biyanî bûyîna jin ya hemberî xwe hem jî ji xwezayê durketin, hember xwezayê ne baldar tevgerandin hember cewherê xwe bîyanîbûyinê ve pêşketîye. Hember jina ku tê wateya jîyanê û dîsa bi vê ve giredayî hember xwezayê derketin di esas de tê wateya wendakirina mirovatîyê. Dema mirov behsa hevsengîya gerdûnê dike pêwîstê mirov rastîya “mirin” jibîr neke. Di esas de mirin ji bo nûbûyînê çalakîyek bi wateye lê ji alîyê pergala

zilamsalar ve ( pergala Kapîtalîst) ew rewş tenê wek xwîna taze ango kârê zêde tê dîtin. Ew jî ne tenê metîngeriye di rewşa dawî de tê wateya faşîzmê. Li gor dîyardeya eko-femînîzmê rewşa îro jin têdeye sedema xwe ji tahakkuma ku li ser xwezayê heye digre. Li gor vê jî xwe ji nav pencên kapîtalîzmê derxistin, sektora kozmetîk ango xweşikbûna sexte redkirin, berê xwe dayîna xwezaya ku em wek bihûşt pênase dikin ewê şêwazêkî pir bi hêz bi me dide fêrkirin. Jiber vê sedemê êrîşên hember xwezayê asteng kirin û telafîkirin di serî de ji bo jin hemû nirxên civakê dayina rûnişkandinê de wê alikarî bide me. Ji bo her darekê ku hatîye qutkirin darekî nû çandin û ji bo xwezayê lêborîn xwestin rolekî giringe. Têlafîkirina kuştina jinan çênabe jiber vê ji bo rêzdayîna jiyanê, kedê û gerdûne felsefeya “rast bifikire, baş bike, xweş biaxife” ya di jinê de dijî, di şexsê jinê de hem ber xwezayê vegera cewhera jîyanê ye û pêwîste ev rastî were parastin.

## “NÊZÎKATÎYA JIN BERAMBERÎ XWEZA DÎYARE Û BI BANDOR E”



Ş. EVÎN ANDOK


Ş. ROJBÛN AMARA


Ş. BERFÎN RÊBAZ

# BEŞA 10

# BI MEYZEKIRINA JINÊ KÛANTÛM



Kûantûm, kûark, atom, perçikên jêr atom, ronahî, dem û hwd. Ev fizik an jî felsefeya kûantûm kû hin bi sedan têgîn û tegehan di xwe de dihevîne û pir şirovêyan re rast hatiye çiye gelo? Em hewl bidin hem ji alîye wê ya dîrokî de û fizikî dest bigrin hem jî emê çavê jina ciwan li vê zanistê binerin, bê ka çawa bandor li ser jîyana me dike û em çawa di nav kûantûmê de cîh digrin? Bi çawe jin û ciwantiyê kû wek nasnameyên herî zêde taybetmendiyên felsefêya kûantûm îfade dikin
nirxandina vê mijarê ji bo Jinêolojiyê wê daneyên pir girîng derxîne holê. Bê gûman ji bo hemû zanist û beşê jiyanê kû tenê meyzekirina zilam tên pênasekirin û dî nav ferasetên mûtlaq de tên hepskirin ev mijar derbasdare. Lê bi taybetî mijara Kûantûm jiber hîn zêde têkîldarê hûrgûlî û wateya jiyanê ye, li çawê jin û ciwantî lê nêrandin û careke din girtina dest erkên bingehîn yên pêşiya mene. Ji aliyên mirovên kû li watêya jiyanê digerin pirsên wek ez kîme, jîyan çi ye, em çima hene, ji kûdere tên û diçin kûderê û hwd. bi dehan pirsên wek van hatiye pirsin û rûxmê berdelên giran hin lêgerinvan li pêy bersivên van pirsan gerîyane.

Bê gûman ew hemû li derdora felsefê hatine pêşxistin û lêpirsinkirin. Mirov di vir de felsefe wek fikrandin şêwazên hizirandinê dikare ifade bike. Her wiha mina xwesteka zanîn û jiyan kirina heqîqetê jî tê pênase kirin. Em ê jî ji pirsên zarokekê kû li xweza yê dike bigrin heta jîyana exlaqî û polîtîk a xwezaya civakî biçin û wir li felsefeyê binêrin. Em bawerin emê li wan deran de bibînin berovajîya pirskirina pirsên bê bersiv felsefe şêwaza watedayîn û jiyankirina heqîqetêye. Heta dikare bê gotin felsefe ifadeya tekiliyên di navbera xwezaya yekemîn û xwezaya dûyemîn de ye. Di civakên xwezayîde ji ber anîmîzmê yanî rûhberîye jixwe bi awayek felsefîk dihat jîyan kirin, şûna pirsên kû li wateyê digerin jiyan bixwe wate dihat jîyankirin. Piştî pêşketina şaristanîye li şûna gîhîştina heqîqetên civakî û xwezayî û di vê oxirê de bikaranîna rêbazên felsêfîk zêdetir fîzîka klasik wek sedem û encam hatîye avakirin û bûye rêbaza sereke ya hişmendiya pergalê. Fizîk di watêya giş-

tî de wek zanista zanîna xwezayê tê pênasekirin. Hêz û tevgerînên di nav xwezayê de bi zagonan lêkolîn dike û hewl dide bigihije encamê. Lêkolînên fîzîki bi pêşketina civakbûyînê re û meraqa mirov ya hember xwezayê re destpêdike. Dikare were gotin kû fîzîkzanên ewîlî ji jinên piresehrin kû ji bo pêdivîyên civakî ji xwezayê sûdwerdigire, çavderî dike, dişopîne û têkiliyên maddi -manêvî ava dike. Heta roja me ya îro çanda fîzîkzaniya jin ya xwêzayî qederekê berdewam kiribe jî di encama zayêndperestîya civakî de ew qad jî hatîye dagirkirin û ketîye bin xizmeta pergala kapîtalîst. Bi pêşketina endûstrî, teknolojî û nîqaşên felsefe re sedsala 19. de pêşketin û lêgerînên zanistî digihije lûtkeyê û fîzîka klasik di pir qadên jîyanê de wek rêbaza sereke tê bikaranîn. Fîzîka klasik hebûnên mezîn û hêdî tevdigerin lêkolîn dike. Her wiha xwe dispere çavderî, cerebandin û zimanê wê jî wek bîrkarî tê pêjîrandin. Li hemberî fîzîka klasik a Newton kû mirovan daxistîye asta makîneyan, parçe parçe kiriye û dîxwazê mirovan bi hejmarên bîrkariye re pênase bike, alîye hêst, maneviyat û hissî de fîzîka kûantûm vegera rastîya mirovbûyînê, zîndîbûyînê pêkan kiriye. Fîzîka modern yanî fîzîka kûantûm jî atom û jêr atomên kû pir lez tevdigerin lêkolîn dike.

Kûantûm tê wate ya "Paketên Ronahîyê". Ji van pakêtên enerjîyê kû ji ronahî, germahî û radyasyonê pêktê re- Kûanta- tê gotin. Ev perçikên jêr atom bi awayek ecêb tevdigerin û li gorî zagonan nakevin nava tû formekê. Wek felsefeya ewil lêgerinvanîya jîyana azad pîştî hezaran salên ku di bin sîya zanistên pozîtîvîst de derbas kiriye carekedin wek fîzîk an ji felsefêya kûantûm bi awayekî nûjenkiri derketîye pêşîya me. Di vir de divê bê zanîn ewe ku felsefe tû caran jî holê ranebûye û kûantûm ji carekê de ne ketîye jîyana me. Di destpêka cîvaka xwezayî heta nîha felsefe û kûantûm di zikhevde bi rêbaz û şêwazên cuda dom kiriye û di pêşketina dîrok û hişmendîyên civakan de bandorek mezin leyistiye. Dibe kû ji despêkê ve wek "felsefe" an jî "kûantûm" nehatibin têgînkirin lê belê heqîqeta her dû pênaseyan jî di jiyana civakî de rol girtine û ji bo fêmkirina tekiliyên di navbera xwezaya yekemîn û xwezaya dûyemîn de esas hatine girtin. Îro fîzîka kûantûm kû dikare meyzekirina

hemû mirovan ya li hem ber jîyanê jî aliye şaristanîya demokratik ve bigûherîne û hemû heyinan têxe ferqa xwe wek felsafeyek jîyanê wêdetir wek fîzîka klasik a herî pêşketî di bin xizmeta hêzên kapîtalîst de tê bikaranîn. Ev felsefeya kû dikare hemû mûcîzeyên gerdûnî derxîne zanebûnê, di serî de santralên nükleer û bombeyên atomî di pir pêşketinên teknolojik yên dawî kû di bin wênerîna endûstrîalîzmê de ne li dijî civakê tê bikaranîn.

Ew rewşa tirsnak jî wek pêşketinên herî dawî yên teknolojik tên pejirandin. Helbet bi rêbazên teknolojîya pêşketî li cîhana kûantûm mêyzêkirin û hêwldana fêmkirina rastîyên jiyanê giringê. Lê niha jî pêşxistina teknolojiyan û ceribandinên teknîkî zêdetir divê di alîye zîhnî de mêyzekirina kûantûmîk bê pêşxistin. Hem li ser danehevên civakî hem jî di encama lêkolînên zanistî de hatiye dîtin ji jiyana em dibinin wêdetir jîyanek hîn enerjîk ya herikbar, berfirehtir û ziravtir heye. Ji bo wê divê em mêzekirina fîzîka klasik a çors kû her tîştî tenê maddî digire dest derbas bikin û bi awayek hîn zirav, bê sînor, xûliqdar û gûherîner li jîyanê binêrin.

Tam jî di wir de rol û misyona jin û ciwantî dikeve dewrê. Ji ber jin hîn zêdetir nêzîkî jîyan û azadîyê ye zêdetir nêzîkî felsefeya kûantûmê ye. Dema enerjîya jin a herikbar bê fêmkirin têkilîyên civakî û xwezayî jî zûtir dikare bê pênasekirin. Her wiha taybetmendiyên wisa wek zindîbûyîn, herikbarî enerjik û bi tevgerbûyîn di cihe xwe de nesekinandin, ya heyî têr nedîtin, lêgerînvanî û nûbûyîn, gûhertin û vegûhertin taybetmendîyên sereke yên nasnameya ciwantî îfade dikin. Ji bo wê qasî nasnameya jin nasnameya ciwantîyê jî nezî zanista jinêolojîyê ye û li gor taybetmendîyên me li jor hêjmartin ciwantî, jineolojî û kûantûm di nava hev de ne. Di esasê xwe de bi hev re dikarin zemîna jiyana azad avabikin û têxin meriyetê. Taybet jî wek jinên cîwan jiber xwedîye dû nasnameya bingehîn ya jîyanê ne di lêgerînvanî û fêmkirina jîyanê de rola me zêdetir dibe. Jixwe ew taybetmendîyên hevpar li ser berjewendîyên civakî rast jiyankirin wê bi xwe re mêyzekirina jineolojîk û fikrandina kûantûmîk jî pêşbixîne û wê di jiyanê de rê li ber gûhertin vegûhertinên mezin vebike. Ji bo vê ya girîng ewe em

têkevin ferqa jiyana xwe û tekîliyên ser esasê exlaqî û polîtîk avabikin. Wek jin û ciwan hem rastîyên me yên civakî hem jî rastiyên me yên bîyolojîk ji bo fêmkirina heqîqeta gerdûnê derfetên mezin dide me. Ji bo vê kûantûme jî ferasetên teknîkî zêdetir bi vî avayî fêmkirin û lî pey heqîqeta wê ketin mijareke giring e. Kûarka herî biçûk be jî di nav gerdûnê de her hebûnek bi armanc tevdigere. Li ser vê esasê bi armanc û wate li her tîştî mêyzekirin li gor vê nêzbûyîn feraseta herî rast ya fêmkirina ewilî a kûantûme ye. Wek jin û ciwan kû di gûhertin vegûhertina zîhniyetên cîvakî de rolên sereke dîlêyzin. Ji bo li hember hişmendiyên fîzîka klasik bikaraniye felsefe an jî teorîya kûantûm bidin avakirin pêwîstî bi zanîna mabdeyên kûantûm heye. Ger em dû mebdeyên sereke yên kûantûm îfade bikin wihane; Li gorî mebdeya nediyariyê ya kûantûme di jiyanê de feraseta kû sedî sed her tîşt dikare bê diyarkîrin tê bihûrandin, mêyzekirinek hin xûlûqdar û azad tê avakirin.

Di sînorê kûantûm de rola fîzîka klasik dawî dibe û nediyarî wek mebdeya sereke tê hilbîjartin. Di kûantûmê de kaos û ne diyarî zêde ne û îhtîmalê şêwazên pêkhatinan bêdawî dibin. Li gor vê mabdeyê tiştek di heman kêlîyê de dikare dû rewşande be. Yanî hem xûya bike hem xûya neke, hem li vir be hem lî cîhekî din be. Her wîha pir cûrê bûyina gerdûnê tenê dikare bi vê mabdeyê bê îzahkirin. Ev rewş dogma û qalîbên mêjiyê mirov dîşkîne û zorê dide hêza fikrandinê. Di vir de di xetek rast de pêşketin çênabin. Encamê her tîştî dikare cûda bibe. Ya kû van cûdabûyinan diyar dikin jî xwestek û hewldanê kes bixwe ye. Pêşdarazî li vir hûkmê xwe wenda dike û rê li ber dewlemendiya fikrandinê vedike. Berovajiya vê mabdeyê nêzîkbûyin jî di jîyanê de wek reş-spî mêyzekirina bûyer, kes û pêşketînan bi xwe re tîne. Feraseta reş-spî, mêyzekirinê têng dike. Fikir dixe nav sînoran, dîcemidîne û mirina fikir bi xwe re tîne. Li gor mabdeya têkilîyên gerdûnî jî, di navbera du an ji zêdêtir tiştên ku li cihên cûda ya gerdûne de ne têkilî dîkare bê avakirin. Jiber gerdûn yekpareye, kêm an jî zêde, dûr an jî nêzîk her tîşt bi awayêk paralel bi hev re gi redayîye û torekê tekîlîya mûazzam xwe didomînê. Di navbera kes, cîvak, û xwezayê de

tekîlîyên xûrt hene û ev têkilî xwe dispêrin azadî, hîskirin û zîndîbûyinê. Ji bo vê di mirov de îfadekirina gerdûne jî, xwe di gerdûnê de avakirina mirov jî dikare pêkan be. Ger em ji bo herdû mabdeyan mînakekê bidin; Li Çîn'ê bask hêjandina perperîkekê roja din li Efrîqa dîkare rê li ber bahozekê veke. Di pêvajoya kaosên kes an jî civakan de jî fikir, bûyer an jî bandorek biçûk dîkare rê li ber têqînên kesayet an jî şoreşan vebike. Hin dêmên kû em ne li bendê ne qewîmîna hin bûyeran, derketina hin kesayetan girêdayî vê tekîlîya xûrt a di navbera mirov û gerdûnê de ye. Em nizanibin jî, em nebînîn jî enerîjyek mezin ku li ser qewîmîna bûyeran dikare bandora xwe bike heye. Carna dema hîn xwestek an jî fikren kû em ihtîmala pêkhatinê nadinê di pratîkêde derdikeve holê em dibejin xwezî min tîştek din bixwesta. Di vir de em ne di ferqê de bin jî têkiliyên di navbera me û xwezayê de zemîna pêkhatîna pir tiştî ava dike. Ger em bifikrin em ê bibinin kû bi dehan mînakên wek vê di jîyana me ya rojane de derdikêvin holê. Ferasêtên kû mirovan, civakan, xwezayê û dîrokê wek paşeroj, niha û pêşeroj ji hev qût dikin piştre hatîne pêşxistîn.

Ya esasî dîvê em bizanibin di kûantûm de tîştêk nabe nînê. Ya girîng ewe mirov wate bide hebûnên derveyî xwe, enerjîya xwe ferq bike û şûna nêrînên dogmatîk, hişk û çors hêza fikir ya esnek, azad û xûlûqdar pêş bixîne. Li gor hemû nirxandinan kû me kirine hem di mêyzekirina Jinêolojî hem jî di mêyzekirina kûantûmîk de mînaka herî şenber Rastîya Rêbêr APO û Paradigmaya Civaka Demokratik, Ekolojîk û Azadixwazîya Jinê ye. Ji bîr nekin enerjîyek pir mezin a gerdûnê li pêşberî me ye û em bi xwestêk û hewldanên xûrt dikarin bigîhijin heqîqeta vê enerjiya gerdûnî û vê heqîqetê bi awayek azad jîyan bikin. Ya giring ewe divê bizanin tû tîştêk nabe nine.

**"DÎVÊ EM BIZANIBIN DI KÛANTÛM DE TÎŞTÊK NABE NÎNÊ"**

## BEŞA 11

# DI ROJA ME YA ÎRO DE ŞERÊ BE EXLAQ KU LI SER JINÊN CİWAN TÊ MEŞANDIN



Şerê Taybet tê wateya tiştekê bi zext û zordarî bidestxistinê. Di dîrokê de şerê despêkê di navbera zayendan de hatîye pêşxistin. Hiyerarşiya ku hate pêşxistin re desthilatdarî di nav civakê de hat belavkirin, şer piranî di nava dû hêzan de pêşketiye. Yê ku şer pêşxistiye aqlê zilam e û li ser esasê dagirkirinê, avakirina çînên serdest û bindest pêşketi ye. Çima hêzên destilatdar pêwîstî dîtiye ku şerê taybet pêşbixîne? Şerê taybet di şerê cîhanê dûyêmîn de hatîyê pêşxistin. Di sedala 21.emîn de aqlê zilam wek sazîbûnek dewletê tê domandin. Niha jî ev polîtîqayên şerê taybet li ser avakirina yekdestdariyê tê meşandin û tu qural û exlaq di nav xwe de nahewîne. Hêzên hegemon hîn zêdetir li hemberî hêzên berxwedanvan şerê taybet dimeşînin. Bi vê dixwazin qelehê ji hundir ve fetihbiki. Ji bo vê rêbazê qirkirinê li hember civakê dimeşînîn û dema bê encam dimînîn jî seri li rêbazên dîtir didin. Dewlet hêza xwe ji vî rêbazê digire. Li gorî vê rêbaz û amûrên xwe dewlemend dikin.


Dijmin herî zêde dixwaze bi meşandina rêbaza şerê derûnî ve encam werbigre. Ji bo vê xwe nava hemû beşên civakê belavdike û ji bo berjewedîyên xwe her tiştî bikartîne. Rêbazên sereke jî dibistan, televizyon û înternetê bikaranîne. Sazîyên dewletê hemû di çarçoveya vî şerî de tên bikaranîn. Tiştên bêexlaqî li ser civakê didin meşandin. Herî zêde jî li ser jinên ciwan dimeşinin. Bi armanca ku nirxê civakê tûnebikin nêzdibin. Ev rewş zarok ji di nav de li ser her ferdek civakê bandorîyek avadike. Bi van rêbazan dixwazin jiyanek çewt bidin avakirin. Di vir de rolê ji bo jin haiye diyarkirin jî zilam weke parazvan dîtine. Zîhniyetê zilamsalar li ser jin didin avakirin û bi rêya rêzefilman tarzêkî jiyana yoz dixwazin bidin pêşxistin. Zilam wek hêz te nişandan û jin tenê xwe ji bo zilamekî amade dike. Di navbera jin û zilam de tekîlîyên bê exlaqî tên pêşxistin. Ev dihêle jin ji xwezayê û ji zayenda xwe dûr bikeve. Roja me ya îro giştî cihanê lîstoka popçi tê listin û ev lîstok bi temamî polîtîkayên şerê taybet pênase dike. Di nav civakê de şiddet tê peşxistin. Jinên ciwan jî heya as tekê ketine bin bandorîya vê lîstikê. Şîddet di xwezaya jinê de nîne. Bi van lîstîka re dixwazin di jinê de hestên şiddete avabikin. ji bo vê pêwiste em

van leyistîka ji rêzê negrin dest. Pêwîste em van erîşan weke polîtîkayên dijmin yên taybet bigirin dest. Li dibistanan de dewlet polîtîkayên taybet dimeşîne. Ji bo pêşerojê civakê li ser esasê berjewendiyên zilam-dewlet amadedike. Pîşesazîyê ku jin bike jî zilam hildibjêre û tenê bi çarçoveya ku zilam danîye re sînordare. Jin nikare bibe zanyar an jî feylesofek, tenê zilam dikare bibe zanyar. Pergal vê hişmendiyê di nava civakê de belavdike û li gorî vê rola jin dîyar dike. Jinê re rola zarokanîn û mezinkirin tenê hatiye dayin. Heman demê civakê giredayî înternetê dikin ku tenêmayîn û takekesbûyin pêşbikeve. Ev jî têkîlîyên civakbuyinê de lêwazî çêdike. Civak bê refleks dimîne. Di qada werzîşe de jî şerê taybet tê meşandin. Werzîş aîdî zilam dîtin heye. Mînak futbol wek leyistoka zilam tê dîtin. Biryarê em ji bo jîyana xwe didin cîqas me îfade dike.  Ji ber her ji aliyê hinekan ve hatine birêvebirin, jinên ciwan di her qadên jîyanê de nikarin xwe îfade bikin. Li Bakurê Kurdîstanê ji milê leşkerên Tirk ve gelek jinên ciwan bi tecawûz û destdirejîyê re rû bi rû manê. Polîtîkayên taybet li ser jinên ciwan di meşînin ku wan durî ax û welatê wan bikin. 24 saatan civak bi vî şerî re rû bi rû tê hîştin. Encam de hêstên însan jî dikevin bin kontrola dewlet-zilam de.

Wek jinên ciwan bi zanebûyinekê kûr ve pêwîstê em vî şerî vala der bixin. Ji bo vê jî tekoşînkirin pêwîste. Ev polîtîkayên dewletê dihêle ku jinên ciwan hemû wextê bi fîzîka xwe mijulbûyinê re bikarbînin û dûrî tekoşînê bikevin. Sedsala 21.de şerê ku herî sereke li ser civakê tê meşandin ev şerê taybet e. Bi meyzekirina Jinêolojî em dikarin van rêbazên şerê taybet fêmbikin û vala derbixin. Tenê jina zane dikarê civaka xwe bûguhere. Zanist aîdê tevahî civakê ye. Civak bi pêşengtiya jinên ciwan divê ji nû ve ji mile exlaqî û polîtîk ve were avakirin. Li gorî nasnameya ciwantî pêwistê jinên ciwan tekoşînek rast bimeşînin, heqîqet û rastiyê bibinin.

**“WEK JINÊN CIWAN BI ZANEBÛYINEKÊ KÛR VE PÊWÎSTÊ EM VÎ ŞERÎ VALA DER BIXIN”**

# BEŞA 12
# LI BERAMBER DÎROKA DESTHILATDARAN BI TEKOŞÎNÊ RE NÛ VE VEJÎNEK



*“Dîroka koletiya jinê nehatiye nivisandin,*
*dîroka azadiya jinê jî benda nivîsandinê ye”*
*- Rêber APO-*

Li ser vê gotina Rêber APO ya dîrokî divê em dîroka tekoşîna xwe bi dest bigrin û di mijarên çima tekoşîn dikin? Çawa tekoşîn bidin? Wek jinên ciwan tekoşîne de rola me cîye? û hwd. de carek din rûyê xwe li dîrokê vegerînin. Ji bo têgîna “Tekoşîn” ê tenê wek dijberîya hin tiştan û bertek dayîna hemberî wan dest girtin tekoşînê sînordar dike. Divê mirov tekoşînê, jî dîrokê heta niha wek qonaxa ku jin gîhîştiyê bizanibe. Koletîya ku 5000 salîn xwe dispêre hîşmendiya zilamsalar di şert û mercên roja me ya îro de wek heqdestiya erzan bê îfade kirin jî xwe dispêre dildarîyê. Ji ber vê jî, ji bo tekoşînê lêpirsînkirina hîşmendiyê hewce dike. Wek encamên wan lepirsinan û rêbazan gerandin, hêrs û acizî jiyan kirin ji alîyê şoreşa hişmendiyê ve xwedî giringîyekî mezine. Dema li rûpelên veşartî yên dîrokê bê mêzekirin ev piştre xûya dibe. Mesela dîrok her li ser navê hin kesan tê nivîsandin û yekpare nayê destgirtin. Dîsa li gor mêjiyê zilam jin di nava dîrokê de ne xwedî giringîyekê ye. Dema em wan lêkolînan bikin dikarin di sê qonaxan de binirxînin,

1) Serdema Neolîtîkê
2) Avabûyina hişmendiya zilam
3) Dêsthilatdarî û pergala kapîtalîzm

## 1) SERDEMA NEOLİTİK

Serdemekî ku rol û misyona jin di asta herî jor de tê jiyankirine. Dîsa otorîteya jin bi awayek xwezayî civakî, klan û kabîleyan li derdora xwe kom dike aliyê exlaqî de rêvebirina civakî awayek xwezayî pêşdikeve û tê pejirandin. Pir li pêş nebûyîna zilam wek pirsgirekekî nayê dîtîn. Lê bi pêşketina nêçîrvaniyê re hîşmendiya desthilatdar ya zilam ku jinê esas nagre careke

din rûyê xwe derxist holê. Ji bo vê zilam di vê pêvajoyê de piştî nêçîrvaniyê awayek hovane êrîşi jinê û jîyanê kiriye û xwestiye jinê têxe bin serwerîya xwe. Vê pêvajoyê de ji İnanna dizîna '104 ME' yê Enkî wek qonaxek dîrokî dikare bê desgirtin. Ji ber '104 ME' di esasê xwe de îrade, otorite û hêza jin temsîl dîke. İnanna ji vî alî ve pir tekoşîn meşandiye. Her çiqasî İnanna hewl bide 104 ME yên xwe vegerîne jî hîşmendiya qûrnaz û hovane ya zilam her cûre zordariyê bikar aniye. Esasê xwe de dersên girîng ku em ji vir derxînin hene. Divê vîna me ne di destê zi lam de be. Dîsa laş û mêjiyê me pêwîste nebe malê hîşmendiya zilam divê bibe malê jiyan û tekoşîna jinê. Pêwîstê xizmetê civaka exlaqî û polîtîk bike. Mijarekê din ku dive em ders derxînin ji xwedî derketina '104 ME' yên li keda xwe, afirîneriya xwe xwedî derketin, tekoşînê de israrkirina jinê ye. '104 ME' yan de israr di afirandina jiyana exlaqi û polîtîk de israr e.

## 2 ) AVABÛNA HİŞMENDÎYA SERWER YA ZİLAM

Di vê pêvajoyê de esasî dû qonax hene. Ya yekemin malbat-dewlet, ya dûyemin jî bo dîtina hîşmendîiya zilamsalar gîrîng e. Mêjiyê dewletê mejîyeke ku li ser yekdestîya hişmendiya zilam hatîyê avakirine. Der heqê îradeya jinê de tiştekî xûya dike tûne ye. Di qada jiyanî, leşkeri, hûqûqî û hwd. li tû qadan rengekî girêdayê jin xûya nake. Di dewletê de hem awayekî vekirî hem awayekî sergirtî polîtîkayên ku hişmendî ya zilamsalar pêk tîne di metîngeriya keda jin de roleke mezin dilîze. Ji bo vê keda jin dibe malê zilam. Heman demê de dikarin vê pêvajoyê wek berdewamiya  qonaxa yekemîn jî bibinin. Dîsa malbat wek prototîpa hişmendiya zilam rolê dewletê dilîze. Yanî dibe prototîpa hişmendiya ku dewletê de pêk bê.

Li derve dewlet li malê de jî dewleteka biçûkheye.  Tê xwestin ku ev rewş wek çarenûsa jin û ciwanan bê pejirandin.   Sedemeke din ya mijara me jî pêvajoya şer e.  Di vê pevajoyê de jî jin ji bûyina amûra şer xelas nebûye. Bûye makineya pêşwazikirina leşkerên şer. Wek amûre zarok anînê, ji bo şer maddi û manevi pêşwazîkirina pêwîstiyên şer hatine karanîn. Ji rewşa bûyina

makineya zarok aninê ji pêşwazîkirina pêwistiyên şer derketin jî bûyina xwedî iradeyeke mezin re derbasdibe.

## 3) PERGALA KAPITALIST Û DESHILATDARÎ

Hişmendiya zilam ku berdewamiya deshilatdariyê pêkan kiriye li kêleka li ser jinê zext avakirinê rêbazên keda jinê metinger kirine taciz û destdirêjî kirinê ji pêk aniye. Pergala kapitalist ji bûye pergalê ku deshilatdari avadike û jinê kiriye rewşa keybanûya dildar ya metayan. Jin û jinên ciwanên ku di bin rûpoşa makyaje de ji xwebûnê dûr dikeve di nava van pencan ve herdiçe pêşketinê jîyan dike. Li wir jina ku di nav pencê kapîtalîzmê de pêşketîye her ku diçê parçe parçe dike. Di bin navê modernbûyin û modayê de jinên ciwanên ku wek xemla vîtrînê û amûra tatminkirina zilam tên amadekirin û ew rewş xwezayî tê nîşandayin. Lê di vî xalî de civak bi bêexlaqîyekî pir mêzîn re rû bi rû tê hîştîn. Di vê mijarê de jinên ciwan edî pêwîstê têkevin ferqa xwe nebin ya zilam bibin ya xwe. Jin pîştî vê saetê edî pêwîstê têkevin ferqa xwe, her tiştê ku dikin divê ji bo xwe civakê bikin. Di mijara tekoşînê de divê li ser pir mijarên bisekinin. Di vê çarçovêde hin mînaka jinên Rojhilata Navîn dayîn girînge. Yek mînaka herî girîng tekoşîna jinên Afganîstanê ye. Taybetmendîyên Afganîstan hîn zêde dişibe çanda Aryenîk e. Dî sala 1977 an de rêxistina RAWA hatîyê avakirin. Rêxistinbûyinên wan yên herî radîqal MÎNA û RAWA ne. RAWA hîn zêde hemberî Talîban e. Têkoşîna wan jî bi wî awayî pêşdikeve. Heman demê di sala 1997'an de cara yekem li Misirê konferansa jin pêktê. Çalakîyên wan yên ewilî ji hemberî İngîltêre ye.

Li kêleka tevahî van rêxistinên jinan behsa tekoşîna jinên PKK'yî ku di tevahîya cihanê de deng vedaye kirin jî di fêmkirina rê û rêbazên tekoşînê de rewşek şenber derxînê holê. Ji vî alide tekoşîn û artêşbûyîna jinên PKK bi awayek çekdarî şerkirina wan di wateya îradebûyina jin de xwedî giringîyêk mezine. Jinên Kûrd di çarçovêya fikir, felsefe ya Rêber APO de pirsên jina azad kî ye? Divê çawa bibe, çawa dikare bi îradê bibe jixwe pirsîyê, bi saya Rêber APO  ji bo bersivê van hewldanek mezîn nişan dane. Rêber APO ji hêza jin bawer kirîye û hêza jin mezin kirîye. Rêber APO dibêje " Di wateya îdeolojîk û rêxistinî de jina ku xwe kûr bike dikare bigihîjê nasnameya jina azad. Heta jin nebe xwedî îrade, nebe

xwedî nasname, nikare feraseta azadîye di xwe de ava bike. Têkoşîna rêheval Sara wek tîmsala azadîyê tê pênasekirin.

Di şexsê Şehid Sara, Şehîd Rojin Gewda û Şehîd Leyla Agirî de jina azad pênasekirin û mînak girtin giringe. Her sê jinên şoreşger de azadî vegûherîye rastîyeke û qereqter qe zenç kiriye. Tekoşîna Şehîd Sara sedema tekoşîna me ye. Pêwistê em bibin jinên ciwan yê tekoşer. Wek jinên ciwan bûyîna pêşengê tekoşîna ku di PKK e de hatîye afirandin û rihê fedaî yê Apogerî teyîsandina hemû qadan erkên me yên bingehîne. Divê rêxistinbûyînên me hebin. Hemberî pergala Kapîtalîzmê divê em tekoşînekî bê navber bidomînin. Pevajo ji bo me her diçe girantir dibe. Divê em jî bi berpirsyarî ya ku dikeve ser milê me tevbigerin. PKK jiyanîkirina nasnameya jina azad de xwedî girîngîyek mezin de ye. Di vê wateyê de azadî teyisandîna rihê ku di kêlîyêde tê afirandin e, eynika hemû xweşikbûyinên jinê de ye û pêwîste hemû kes bikaribe ji vê eynîkê li cîhanê binêre.

**"TEKOŞÎNA ŞEHÎD SARA SEDEMA TEKOŞÎNA ME YE. PÊWISTÊ EM BIBIN JINÊN CIWAN YÊ TEKOŞER."**



# BEŞA 13
# ŞOPDARÊN SOFÎA Û ARTEMÎS'AN Û AVAKÊREN BI HIŞMENDIYA CEWHERE XWE
## PARAZVANÊN JINÊOLOJÎ: JINÊN CIWAN



*‘ Serpêhatîya zanistê...bi hebûna mîrov rê û legêrina zanê bûyinê dikeliye de çebûyin e ’*

Zanist, hebûna heqiqeta mîrov ê her dem bêrdewam kirine. Bê gûman ev hebûn bi civakbûyinê re digihije heqiqetê. Her zanebûyin ji cîvak parastin, têr kirin û berdewam kirinê re derbas dibê. Komkirina van jîyanê ava dikê. Giredanbûna zanist û civakê dîrokî yê. Tenê refleks û ajoyên di jîyane de tên diyarkirin jî bi zanêbûyinê re girêdanbûna wê heyê. Ye kû jîyanê bi watê dikê ev zanebûyine, ji bo çi tê bikâranin ji girîng e. Zanebûyin hişmendiyê dide ava kirin hişmendî jî şeweyê jiyanê diyar dikê. Tişta kû em di hizirin, bi zanebûyine digihije watêya jiyanê. Zanêbûyina kû bingeha jiyana mîrovan avadikê, ne tenê pênase kirina mîrov hemandemê de bingeha nirxe civakê  jî derdixîne holê. Di nava civakê de nirxa kom dike û dihêle jîyaneki yekpare avabibe. Zaninên civakî di encama zanîn û mejiyên civakan de ferasata ku jîyanê avabikê di afirine. Divê mîrov carekê din dubarê bike tekilîya zanîne ya bi jiyane re civakî û dîrokî ye. Zanîn beriya dîroka mîrovahiyê çebûye.

Di roja me ya îro de meraq û lêkolîna çebûyina gerdûn û cihanê nişaneya wê ye kû zanin bêrîya mîrovahîyê ji heye û li benda keşifkirinê ye. Hebûna mîrov û hewldana   dîtina zanînê bi hev re pêşketine. Kêlîya zanînê û pêkhatin bi awayek paralel li pey hev de pêşketine. Di kelîya zanînê de jî çêbûyin destpêdike. Zanînê tenê bi kesan ve girêdan wê bibe xilasîya armanca hebûna zanînê.   Hemû zanîn yekparene, civakî ne. Ji ber vê divê her zanist civakî be.  Mînaka vê ya herî berbiçav vegera civaka xwezayî ya kû civakîbûyin û zanist bi hev re pêşketîye wê alîyê dîrokî û civakî ya zanistê carekê din raxe berçavan. Weke nirxên di civaka xwezayî de heye, zanîn jî yekpare ye, her kes zanînê diafirîne û zanîn aîdî herkesiye. Bi kurtasî milkperestî û yek destîya zanistê, tûneye.  Lê zilamê derewkar û qurnaz ji bo desthilatdarî ya xwe ferz bike wê hêza civakî û dîrokî ya zanîstêbikar bîne û bi pêşxistina serdema kole- efendî re wê  zanistê derxîne qata xwedayan ku derveyî wî kesek nikare bigîhije. Ji alîyê zilam ve dizîna ‘104 ME’ yê ku jin di nava civakê de ava kiriye û her ku ev nirx dibe malê zilam ji bo jin û beşên din yê civakê derveyî xulamtîyê tiştekî din namîne. Lê yên ji civakîbûyina zanistê bawer dikin

li hemberî milkpereziyê wê têkevin nava berxwedanîyekê kû heta roja me ya îro berdewam bike. Mînaka Prometheus ku yek ji van berxwederan e, girîngîya van berxwedaniyan nişan dide. Tê gotin ji ber Prometeheus ji xwedayan agir dizîyê ji bo cezakirinê li ser tehtan tê bizmarkirin û kezeba wî ji bi qijakan didin xwarin. Ya ku bi agir tê sembolîzekirin zanist e. Ronîbûyina mîrovan ya bi zanistê li vir wek agir tê îfadekirin. Zanista ku ji bo xwedayan tê qebûlkirin di cewherde ya civakê ye. Xwedayan zanista ku aidê civakê ye xesp kiriye. Metafora ji civakê dizîna zanînê, ji alîyê xwedayên zilam ve desteserkirin tevahî ber hem, zagon û nirxên aîdî çanda xwedawendîyê rave dike. Efsanewîbûyina Prometheus jî li hemberî desthilatdarîya xwedayên zilam ku bi xespkirina zaninê re destpêkiriye li darxistina çalakîyekê civakî re pêkhatiye. Wate ya vê mînakê ya roja me ya îro, di bingeha dîzîna desthilatdarîyê de hêza zanînê berovajîkirin, beyî ked dayinê nirxên aîdî civak û jinê ne wekê yên xwe nişan dayin û li gor berjewendiyên xwe hebûna xwe avakirin e. “zanista civakê, divê bibê ya civak û civakbûyinê” Egêr zanîst nebe ya civakê û heqîqeta jîyana azad, wê ew zanist derveyî rastiya civakê bimîne. Ji ber ve jî divê zanist gor berjewendiyê civakê were sazkirin. Ji bo ev pek were jî divê şoreşa hişmendîya zanistê were çêkirin. Rêbertî ’Zanista civakê keybanûya giştî zanisteyê, mîrov nin be ti wateya zanistê jî ninê” bal kişandîye ser zanista civak û civakbûyinê.

Gerdûn bixwe jî xwe di nava zanêbûyinekêdeye ya kû ji bo pêkhatina mîrov divê zanebûyin bi watê û azad were jîyankirin. Auguste Comte kesê kû despekê zanista civakê penasekiriye. Comte ji ber felsefa kû pêşxistîyê ji zanîste dîtir hîn erenîtir dinirxînê zanîsta xwe wek pozitîvizm pênase dike. Zanîsta herî jor wek zanîsta civakê ya herî jêr jî wek zanista giştî bîrkarî dibinê. Zanista kû wek pozitivizim pênase dike ji şîroveyêre girtiye û gor xwe zagonan diyar dike. Li keleka pozitivizmê di asta herî jor de ol bikaranine û lêpirsina civakê ji binî ve tûnekiriye. Ev yêk hiştiye kû civak di nava tarîtiyê de bimîne. Armanca zanîstê ji avakirinê zadetir hewldane civakê bi hişmendîya kû dixwazin birêve bibin. Ev zanist xwe nekarîyê xwe ji kapitalizme xilas bike û bûye bingeha kapitalizmê. Bi vê berê xwe dayina navenda rojavayê cihanê wek gavek bêrbi zanêbûyine hatiye ditin û pişta xwe dayina axa mezepotamya kû despeka mîrovahîyê lê pêşketiye derketiye holê. Piştî vê hişmendîya kû tenê Rojava xwedî zaniste derveyî Rojava herkes nêzan û paşdemayî ye hatiye pêşxistin.

Edî li vê derê ji dîrokê qutbûyin pêş dikeve. Ji zanista civakê pêşxistinê zêdetir civakê ji koka wê qut kirin hatiye pêşxistin. Em vê hişmendîyê wek pisgirekekê kûr di roja me ya îro de jî dibinîn. Edî kesek nikare bigihije zanista ku xwe ji pergala kapitalizmê têrdike bi vî awayî vê zanistê xwe wek labatuvar giştî xwe ji civakê qut kiriye. Bi vî awayî ev labaratuvar tenê bûye cîhê nexweşi peyda kirine û civak anîne wê astê ku xiriz û qeyranê peyda kirine. Rastîyan ji cewher derxistin û derewên xwe wek rastî nişan dayîn de hişmendiyek mezin didin ava kirin. Ev rewş serdema Sûmeran tîne bîra mîrov. Heman demê rahibên Sûmeran kû hemû nirxên zanistê ji jinê dizîne jî tê bîra mîrov. Van rahîban ji bo kû civakê di bin serwerîya xwe de bidin meşandin bi her awayi zanist bi kar anînê. Tişte kû di xwezayê de diqewimê weke rahip bixwe ve guhertinê pêş dixinin, bi van şaşitiyan civakê ji bo berjewendiyê xwe bi kar tînîn. Di roja meyi îro de jî bi şêwaze cudatir van derewên xwe dixin merîyetê. Nexweşiyên destpêkê di labaratuaran de ava dikin piştrê jî xwe wek xilas kerên civakê nişan didin û pêşkeş dikin. Qeyranên kû civak jîyan dike em nikarin ji zanista civakê ya kû navênda rojava pêş xistiyê qut bigrin dest. Teknik û zanistên li hemberî pisgireke şer, birçîti, serdesti û nexweşiyan kû ji bo mîrovahîye pêş xistine heta astekî wek xilasî hatibin dîtin jî di dîrokede ti pergal heta roja me ya îro qasî vê pergalê ev pisgirêk zêde ne kirine. Ev hiştiyê kû mirina mîrovan hin zêdetir bibe û bi vê rêya serdestî ya xwe li ser civakê dane ava kirin û civakê giradayî xwe kirine.

Pergala heyî artêşa bêkara daye avakirin û vê jî wek pêwistiye civakê pêşwazi kirin nişan didin. Lê ti eleqeya wan ji bo pêwîstiyê civakê pêşazi kirinê re nine. Sedema ewqas ji hev qutbûyina zanista civakê, xwe ji zanista rojava bi hêz û têr kirine. Xwe xwedî kirinê di pêşxistina sanayiya şer de ditinê û li ser civakê ferzkirina qeyranan ve pergala xwe ya parastinê avakirine. Vê zanista rojava di nava netew û olan de şêr bi destê xwe ava kirine. Bi rêya zanistê di nava civakê de tundî zêdetir kirine, bi vê rêyê çekên wek envai, kimyewi çekirinê û liser netewên kû besamberi pergalê berxwedidin bi karanîne. Di dorhelekê bi vi rengî de ji bo mîrovahî ne çand, ne ziman tu tişt nehiştine. Civakêk bê armanc, bê bawerî avakirine. Di nava vê rewşê de ciwanên di alîyê rûhî de ketine valatiyê edî nizanin wê bêre xwe bidin kuderê. Kesê bê armanc jî wê bêre xwe tenê bidê maddeye hişbir, fûhûş û çandekê yoz. Bi xêtên sitûr; avakêrê qeyranên ku civak di serdema

pergala kapitalizme de jîyan dike ev zanista civakî ya behsa wê tê kirin e. "Navênda rojava li sêr serdestîya zilam, bi zayendperestiyê re li ser navê jine koletî ava kirin e". Zanist di pêşketina jiyana dîrokî û civakî de wek berhemekî giring di nava jiyana me de cihê xwe digrê. Tenê bi destê zilam vesazkirina jîyana kû her wext di nava tevgerê de ye hiştiye mîrovahî bê navber di nava qeyranê bijî. Ji bêr ev zanist bûyê qada zilam penasêya jiyanê kirin jî zehmet bûyê. Sedema vê jî zanista kû ji alîyê navenda rojava ve hatiye pêş xistine. Ya destpêkê zanist û zanebûyinê avakiriye jin e, lê pişti derewên zayendperestî ev zanista ku hatiye berovajîkirin hêta roja meyî îro ji didome. Jin heta îro jî dev ji tekoşina xwe bernedaye û ev jî di rihê jinê de şînbûyinê û bi rêya zanist civakî wate dayina jîyanê îfade dike. Li hember rola kû per gal daye jinê mîrov dibine kû zanista civakî di rihe jinê de veşartiyê lê jin ne divê ferqa heza xwe de ye. Di bingeha hevîrê kû jin çedikê de jî zanist heye, pevajoya kû hevîr tê tirşkirin bandora ceribandinên kimyavî heye. Bê sedem ji bo jinê nabêjin "Bi hevîrê destê xwe, tevli karê zilam nebê". Di vê gotinê de em dibînîn kû pergala navendî ya rojava çawa zanîstê berêwajî dikê. Dîsa xwarina kû jin çedikê tekiliya xwe bi kimya û ceribandina ve heyê.

Dema jin tiştên bi asît tirş dibin çêdike dizane bê ew asît çi bandorî li avê bike. Eger zanîst bi çavdarî û ceribandinan pêşdikeve mînaka vê ya herî berbiçav jî; wextê jin tirşoyê de sîrik bikartîne dizanê roja ditir ewê bandorîya xwe bike, yan jî dizane kû salataya çêdike wê roja ditir asîda xwe berde û li gorî van zanêbûyinên xwe ji jîyanê vesaz dike. Di van mînakan de jî em dibinin kû jin ti carî tekilîya xwe ji zanîste qut nekiriye. Çiqasî jin hewldanên xwe qut nekiribe jî pergala serwer ya zilam jinê ji zanistê dûrxistîye û zayendperestiyê bi şêwazên cûr be cûr herî zêde di zaniste de bikar anîyê. Gava yekem jin di nava jiyanê de bi tahakûma zilam re tê hêliştîn. Jinên ciwan kû di mekteban de dixwînin re tê gotin 'dersa zanistê nê li gorî we yê'. Heman rebaz di listikên herî paqij yên zarokan de jî ev hişmendîya zayendperest bi awayek berbiçav tê dîtin. Navenda rojavayê cîhanê ji bo zilam desthiladariyê ji bo jinê jî koletîyê daye ava kirin. Di bingeh de ji hev cûda kirina kirde- tişt û kole-efendi de em vê rastîyê dibînîn. Avakerê bingeha zayendperesti ji bo berjewendiye iktidare aqlê zilam wek kirde penasekirine jin jî wek amur yanî tişt (nesne) hesibandine. Jin di asta herî jor de ji destê zilam û hişmendîya desthilatiyerê de hatiye hiştin û li kêleka vê ji abori ji hatiye dûr xistin.

Di zanista zayendperestiyê de yê bikaribe aboriyê birêvebibe zilam e û tişta ji bo jinê jî hatiye hiştin bûyina Keybanûya Metayan e. Jin hem ji qadên zanistê hem jî ji qadên abori hatiye derxistin. Cihê ji jinê re hatiye dayin di bazirganiyê de wek amûra sereke mayin û bi vê re zilam tatmînkirine. Bi vê re giradayî rûyê medya yan jî rûyê marqayan bûyin, ji bo destiladarî bûyina maşîneya zarok aninê wek çarenusa pîroz jinê dane ferzkirin. Ya ji vê jî biêştir edî zarok anîn weke ked ji nayê dîtin û pênaseya 'jin bi zarok anînê rê dibe jin' tê kirin. Ji bo vê em mînaka çend kesên navdar ku vî fikrî diparê zin bidin. Adolf Hittler dibêje : "Her jinek divê çar zarokan bîne, jina çar zarokan bîne wê were xelat kirin." Dîsa serokwezîrê Tirkiyê Erdoğan dibê je "divê di her malbatekê de sê zarok hebin." Bi van gotinan serokwezîrên dewletan em hişmendîya desthiladar ya zilam bi awayek berbiçav dibînin. Aborîyên dewletan de em dibînîn kû tu mafê jinê di aborî de nehêliştinê û ev hişmendî dîroka netew-dewlet nişan dike.

Netew dewletên wek Tirkiyê de eger em minakêk balkeş bidin; Ji sala 1921'an heta roja meyî îro 31 wezirê aborî hatine guhertin lê di nava van de tenê yek jin heye ew jî Tansu Çiller e. Tansu Çiller jî bi aqlê zilam hatiye amadekirin. Bê guman rewşa giştî netew-dewletan ji vê rastîyê qut nîne. Li ser pirsgirêka zanist ya kû navenda rojava ya cihanê ava kiriye de Reber APO dibêje "pisgirêka abori a esasi wextê kû jin ji abori hat dur xistin despêkir". Bi van nirxandinan zanista bi aqlê zilam hatiye deşîfre kirin. Zanista kû divê civakî be, di bin desrhiladariya zilam de ji rastiya civakê hatiye dûrxistin. Zanista navenda rojava ya cihanê eger dixwaze bi civakê re bibe yek bê guman divê xwe ji zayendperestiyê xilas bike. 'Zanista şoreşê, zanista veguhertinê ye. Di moderniteya demokratik de zanista şoreşe; jineolojî ye.'

Nasîn û zanêbûyin, hezkirinê bixwere tîne. Mîrov zanebûyinê çiqasnasbike ewqasî jê hezdike. Mîrov dibîne kû di her qada jîyanê de feydeya zaniste heye û di encama zanistê de hîskirin pêşdikeve. Di serdema kevin de wek sembola felsefê jinek xwedawend tê nîşandan.Sofîa xwe dawenda zanistê ye. Hezkirina zanistê bi tegîna "felsefe (phylo-sofia)" tê nasîn û ev navê felsefe wateya xwe ji 'Sofia' digre, esas de hezkirina ji bo Sofia ifade dike. Ev heskirina di serdema kevin û roja me ya îro de heye çima em nikarin nûjen bikin û çima em nikarin Sofia'ya ya nû ava bikin. Ji bo felsefe Rêber APO dibêje; "Felsefa me ji fêmkirina wateya çavê hes-

peki bigrin hetta dengê çukekî divê jiyan bi giştî were dest girtin. Ji hûrmet dayîna zaneyê kal em bigrin heta bersivdayina legerina çave jinek ciwan de watedar e." Rêbertî bi vê felsefeyê paradigmaya demokratik, ekolojik û azadixwaziya jinê danîyê holê. Li hemberî zanista rojavayê cihanê xwe avakirin qasî nan û av pêwîstîyên mirovahîyê ye. Modernîteya Demokratik bixwe bi erka avakirine re berpirsyar e. Li hemberi zayendperestiya kû di zaniste de hatiye avakirin hezkirina ji bo Sofia bê guman wê bibe bersiv û wê ev ji wê bibe 'jineolojî' yanî 'Zanista jinê'. Her wiha bi jinê re naskirin wê bibe yekparebûyina modernîteya demokratik û bi vî awayî ewê erken xwe yên avakirinê bîne cîh. Di ve mijarê de Sokrates dibêje; "Pir zanîn girtin zêdetir, ev zanîn ji bo çi û çawa tên bi dest xistin ew girîng e." Ev rêgez di vê wateyêde girînge.

Exlaqê kû bi zanebûyinê re were sitrandin cîhana hişmendîyê re herdem di nava tekiliyekê de bûyinê dixwaze. Zanista modernîteya demokratîk zanista civaka azad e û ji bo ji nû ve despêkirinê firsendeki girînge. Rebêrtî rûyê zanista rojavayê cîhanê ya zayendperesti tekbiriye û li keleka ve Jineolojî ya civakê pêşxistîye. "Zanebûyin bi giştî rehendên zanistê re yani zanist bi felsefe û yekbûyina hûnera hişmendîya civakê re pêşxistin, cewhere hebûna civakê ye." Bi vê nerînê destgirtin û bi civakbûyinêre ve gera cewhera zanistê weke erkekî mezin li pêş me ye. Bê gûman ji bo vê serbixin divê em biçin dîrokê û koka mîrateyên berxwedanîyan binerin. Ji bo jin û civak dîroka xwe rast şîrove bikin û gori vê soyalojîya civakê dahurandin bikin wê jineolojî pêşbikeve. Zanistê bi zayendekê v giradayînê zêdetir cewherê civakê ditin û li gorî ve pêşxistin girînge. Zanista jinê azadiya civakê ji xwe re esas digre. Bi cewherê jinê, bi nerîna zanistî ya jinê, civakek exlaqî û polîtîk avakirin yek ji armancên sereke yên Jineolojî yê ne. Jineolojî bi modernîteya demokratik re weke alternatîfa zanista rojavayê cîhanêye kû di serî de jin û ciwan hemû civakan wek amûr bikartîne. Rebêr APO bi gotina "Wextê gelan e. " li hemberi serdema kapitalizme serdema modernîteya demokratik avakirinê esas digre. Di vê serdemê de li hemberi zanista çewt ya pergalê Jinelojî jî wek alternatif " Wexta zanista civakê" nişan dide. Rebêrti salen 90'de got: "Projeya guhertina zilam tenê bi şoreşa civakê re dikare pêş bikeve" Rêbertî li hember hişmendîya zayendperest, zanistê ji bin yekdestîya zilam derxistin û zanista kû jine jin û civakê hatiye dûrxistin vegerandina cewherê wê esas digre" Taybet wek qada herî pisgirek qada hevjîyana

azad rast dayina ava kirin ewê bihêle kû civak vegera cewherê xwe jîyan bike. Dîrokê de kevneşopîyên berxwedanîyên kû em ji xwe re wek minak bigrin jî hene. Mînaka herî nêzî me Zerdûştî ye. Di vir de tevgera Zühd-Zahitlik' de tekîlîya di navbera Rabia Adevîye û Hasan Basri'ye. Heman demê de mînaka civaka kolektif û evîna Mem û Zin'e, li kêleka vê çîroka Derweş û Edulê mrateyên mezin in. Pewîste ev destan bê lekolinkirin û rast bên şîrove kirin. Her wekî din Rêbertî pê naseya jin û zilam wiha penase dike; dibêje jin di şexsê Afroditbûyinê de pêwîste xwe ji nû ve dest bigre zilam jî divê kesayeta Prometheus ji xwe re minak bigre.

Bê gûman kaosa di nava jîyana heyî de tekiliya navbera jin û zilam ve giredeyîbe ev diyalektika navbera cinsan de pêwîsiya guhertin û veguhertinê heye. Ev ancex bi hevjîyana azad ravakirinê re wê mimkûn be. Tenê ne ji bo jin vegera cewhere xwe ji bo zilam jî derbasdar e. Di ve wateyê de pêwîste zilam Prometheusê kû ji bo civakê ronahîyê esas digre wek minakekê bibine û li ser vê esasê guhertin veguhertinê esas bigre. Di heviyana azad de zilam dibe Prometheus ê kû vina jinê nas dike û ew jî weke jin divê têkeve nava şerekî mezin û vegera cewherê ji xwe re esas bigre. 'Şopdarên Sofia, Artemîs'an û avakerên hişmendîya cewherî parezvanên Jineolojî; jinên ciwan' Jineolojî bi hêza zanista civakê vegera cewhere xwe esas digre; hişmendî daimi kirin û parastinê de pêşengtî dike. Bê gûman ye kû jineolojî belavi nava civakê bike ewê jinên ciwan bin û di şopa Sofia de rol û misyonên xwe yên pêşengtîyê pekbînin.

Jinên ciwan dinamizma civakê temsîl dikin û ji bêr ve jî milê legerînê de vekirine. Ji bo pêşerojê ewê roleki mezin bilîzin. Bi meyzekirinek Jineolojî: pirsgirêk çaresêr kirin, kom kirin, rexnê kirin pêşxistin û bi rêbazên xwe gihandina heqiqetê ewê pêk were. Li hemberî zanista dibin serwerîya zilamde ye seknandin weke erkekî li pêşîya jinên ciwan e. Artemîs jinek ciwan ya parêzvana Anatolya'yê ye; bi tîr-kevan û xezalên xwe tê nasîn. Weke berdewamîya çanda Hûriyan parazvana jina ciwan jî wek xwedevande tîr-kevan tê nasîn. Heman demê de giredayî Artemîs'e weke rahibe ji tê nasin. Taybet wek şerkerek Amozona û şerkera Artemîs yani nîşaneya jinen ciwan temsil dikê. Bi Jineolojî re jinên ciwan xwedî li van taybetmediyên Sofia û Artemîs derdikevin û hemberî pêşxisti na vê çandê berpirsyarin. Dîsa li hemberî li hember hezên destiladar erkên xwe yên dîrokî pêkanîn û parastinê de berpîsyarin. Bi pêşxistin û xwedi derketina Jineolojiyê re ewê tekoşina kû jin didin mîsoger bibê.


"JIN Û ENERJÎ BI HEV RE DIHERIKIN,
MIROV NIKARE JIN Û ENERJIYÊ
JI HEV CUDA BIGRE DEST"
- ŞEHÎD NAGÎHAN AKARSEL



“RÊGEZA BINGEHÎN A SOSYALÎZMÊ AZADIYA JINÊ YE”

- REBÊR APO


JINEOLOJÎ